



Bir dili öğrenmek için herşeyden önce o dilin alfabesini doğru yazmak ve okumak gerekir. Özellikle Kürtçede bazı seslerin birbirine yakınlığı, birbirine yakın seslerle birçok sözcüğün bulunması, doğru okumayı zorunlu kılmaktadır. Burada sunulan açıklamayı kavrayan kişi eksiksiz bir şekilde Kürtçe okuyabilir. Ayrıca bu sayfada verilen Kürtçe dersleri kendi kendine dil öğrenme metoduna göre hazırlanmıştır.

A a : Kürtçe de “a” uzun okunur

Örnek: Av (su), agir (ateş),

B b : Türkçede ki “b” gibi okunur.

Örnek: Bav (baba), bar(yük), bizin(keçi), ber(ön / ürün)

C c : Türkçedeki “c” gibi okunur.

Örnek: cam, conega (tosın), cot (karasaban), car (kere), cêwî(ikiz)

Ç ç : Kürtçedeki “ç” vurgulu ve vurgusuz olmak üzere iki varyantlıdır.

Çoğunlukla vurgulu varyantı kullanılır. Bu okunuş biçimi şöyledir: Dilin ön kısmı ön damağa (diş arkası) yapıştırılarak çıkarılır.

Örnek: Çem (çhem = akarsu), çav (çhav = göz), çivîk (çhivik = kuş), çerm(çherm = deri), çêlek(çhêlek = inek), ço (çho = sopa)

Vurgusuz telafuzda Türkçede ki “ç” gibi dir

Örnek: Çar(dört), çend (çend), çil(kırk), çol (kır/ çöl)

D d: Bu harf de tamamen Türkçedeki “d” gibidir.

Örnek: Dev (ağız), der (dışarı), dar(ağaç), dîl (esir), dil (kalb/yürek)

E e: Türkçede kullanılan “e” harfi gibi ağız hafif açılarak çıkarılır.

Örnek: Ez (ben), erê (evet), dest (el), te (sen =çekilmiş hali)

Ê ê : Türkçedeki “beş, yedi, dedi” Kelimelerindeki “e” sesi gibi çıkarılır.

Kısaca bu sesin çıkarılışı esnasında ağız sağa ve sola kasılarak yayvan hale getirilir. Sesin çıkışı esnasında alt dudak aşağı çekilerek hava dışarı bırakılır.

Örnek: Êzing (odun), êvar (akşam), tê (gelir, geliyor)

F f: Aynen Türkçedeki “f” harfi gibi okunur.

Örnek: fîstan, find (mum), fîdan, fîrotin (satmak)

G g: Kürtçe alfabesinin bu harfi de Türkçedeki “g” gibi okunur.

Örnek: ga (öküz), gul (gül), goşt (et), gotin (söz /söylemek)

H h: Bu harfimiz her zaman okunur, hiç bir zaman yutulmaz, Türkçedeki “h” gibidir.

Örnek: hebûn (var olmak/ malik olmak), hatin (gelmek), hêlîn (kuş yuvası), heyv (ay)

Halk arasında arapçanın etkisiyle az da olsa okunan bir başka varyantı var, bu sadece arap kokenli kelimelerde görülür

Örnek: Hasan, Heci, Husên vb.

I ı : Türkçenin “ı” sından daha kısa dir.

“i” sesinin hafif çıkışıdır.

Anlaşılması için bir karşılaştırma yapalım.

Işık (uzun bir sestir) Kirin (kısa bir sestir) Örnek : Kirin (yapmak), birin (götürmek), mirin (ölmek)

Î î : Türkçenin “i” sindan daha uzun okunur.

Anlaşılması için bir karşılaştırmaya yapalım.

bir (Türkçede 1 sayısındaki “i” kısa dir.)

bîr (Kürtçedeki “î” uzun okunur. Türkçenin iki “ii” sine tekabül eder.) ?

Örnek: Îsot (acı biber), îsal (bu sene), bîr (muhakeme gücü / şuur / kuyu), şîr (süt)

“e” ve “ê” seslerini karıştırmamak için bu tabelayı dikkatlice okuyun.

yazılışı	okunuşu	anlam	yazılışı	okunuşu	anlam
te	the	Sen	tê	thê	Geliyor
dev	dev	ağız	dêw	deew	dev (mitolojik varlık)
ker	ker	eşek	kêr	keer	Bıçak
mer	mer	Bel (kürek)	mêr	meer	erkek
zer	zer	Sarı	zêr	zeer	altın
pel	pel	yaprak	pêl	peel	dalga
kel	kel	kaynama	kêl	keel	dikiş
we	we	siz	wê	wee	O (dişil)

yeniozgurpolitika.org hizmetidir. Kaynak gösterilmeden kullanılamaz.

J j : Aynen Türkçedeki “j” gibi okunur:

Örnek: Jin (kadın), jar (zayıf /güçsüz), jor (yukarı), jêr (aşağı)

K k : Kürtçenin bu harfî de vurgulu vurgusuz olmak üzere iki varyantlıdır. En fazla vurgulu biçimi kullanılır. Vurgulu biçimi dilin ortası üst damağın ortasına (yumuşak damak) yapıştırılarak çıkarılır. Kısacası “g” ile “k” arası bir sestir.

Örnek: Kevir (khevır = taş), kevok (khevok = güvercin), kerî (kherî = parça /sürü), kovik (khovik = honi), kavir (khavır = toklu) Vurgusuz varyantı çok az kullanılır. Türkçedeki “k” gibi okunur. Örnek: Ketin (düşmek), kes (şahıs), kîsik (küçük cüzdan / torbacık), kûsî (kaplumbağa)

Dikatinize: “k” ile başlayan çok az kelime hem vurgulu, hem de vurgusuz okunur. Vurguya göre anlamları da değişir. Kürtçede bütün sözcükler cins takısı aldıklarından. Bu tür sözcükler zorluk çıkarmazlar.

Örnek Vurgusuz 1- Kar (iş ; bu kelime erildir.) Karê min pir giran e. (işim çok ağır) vurgulu

kar (oğlak; bu kelime dişil dir. Diger bir formu da var =karik) Kara bizinê belek e. (keçinin oğlağı alacalıdır.)

2 : Vurgusuz ker (eşek ; kelime olduğu için cins takısı alır) Kera me xweş dibeze. (Bizim eşek iyi koşar.)

Vurgulu

Ker (sagır ; edat olduğundan dolayı herhangi bir takı almaz) Mêrikê ker diçe mal. (Sagır adam eve gidiyor)

Not: Birçok yazar yanlış anlaşmayı önlemek için, vurguluyu iki “rr” ile yanê “kerr” biçimin de yazıyorlar.

L l : Aynen Türkçedeki “L” gibi dir Örnek: Lêv (dudak), law(oğlan çocuk), lepik (eldiven), lal (lal, dili ağır)

M m : Tıpa tıp Türkçe “m” si gibi okunur.
Örnek: Mêr (erkek, yiğit), mîh (koyun), mîr (derebey, emir)

N n : Tıpa tıp Türkçe “n” si gibi okunur.
Örnek: Nav (ad, isim), nan (ekmek), nîr (boyunduruk), nok (nohut), hinar (nar)

O o : Tıpa tıp türkçe “o” su gibi okunur.

Örnek: ol (din), ode (oda), por (saç), sol(ayakkabı), sor (kırmızı)

P p: İki varyantlı olup yüzde doksanbeş vurgulu okunur. Bu vurgulu şekli şöyle çıkarılır: Üst dudak çok güçlü bir şekilde alt dudağa yapıştırılarak vurgulu okunur. “P” ile “b” arası bir ses çıkarılır:

1 : Vurgulu P (bp /ph):

Örnek: par (phar = geçensene), pêrar (Phêrar = eveli sene / iki sene önce), pişt (phişt = sırt), pîşe (phîşe = meslek)

2 : Vurgusuz, Türkçe “p” si gibi.

Örnek: pîl (pil), parçe (parça), plan, pol (sınıf /dershane)

Q q : Arapça “ğ” gibi okunur. Ya da dilin arka kısmı damağın arka kısmına yapıştırılarak birden açılır ve “kanun” kelimesindeki “k” gibi sert biçim söylenir.

Örnek : Qer (siyahın bir tonu), qam (boy), qalind (kalın)

R r : Ağırlıklı olarak Türkçedeki “r” gibi okunur. Yalnız şapkalı “î” önünde iki “rr” gibi vurgulu okunur.

Örnek Roj (güneş / gün), rez (üzüm bağı), rev (kaçış), rîs (yün iplik)

Vurgulu okunuşu:

kirîn (kırırin = satın almak) kirîn (bırrin = kesmek) mirîn (mırrin = homurdama)

S s : Aynen Türkçedeki “s” gibi okunur.

Örnek: Sîr (sarmısak), simêl (bıyık), sal (yıl), sar (soğuk)

Ş ş: Aynen Türkçedeki “ş” gibi okunur. Örnek: Şil (ıslak / yaş), şal (pantolon), şev (gece)

T t : Bu harfimizin de vurgulu vurgusuz olmak üzere çift varyantı vardır.

Yüzde doksan vurgulu varyantı kullanılır. Dilin ön kısmı, damağın ön kısmına yapıştırılır, birden açılır. Yada “th” şeklinde okunur.

1- Vurgulu Örnek: tav (thav = güneş ışını), tarî (thari= karanlık), tîr (thir= ok=,

tûj (thuj = biber acısı), tal (thal = ot acısı)

2 – Vurgusuz, Türkçe “t” si gibi

Örnek: Tor (file / ağ), tas (tas), ta (sıtma), tar (tünek ağacı)

U u : Türkçedeki “ö” harfine yakın bir sestir. Ya da “hö” biçiminde okunur.

Örnek: Gul (ghöl= gül), Kurd (khörd = kürt), gund (ghönd = köy),

Tu (thö = sen), gur (ghör = kurt)

Û û : Türkçedeki “u” gibi okunur. Sözcük başında kullanılmaz.

Örnek : Bûn (olmak /varolmak), çûn (gitmek), tû (düt), rû (surat/sima), rûn (yağ), şûn (yer)

Anlamak için doğru okumak şart. Bu tabeledeki alıştırmaya dikkat edin.					
yazılışı	okunuşu	anlam	yazılışı	okunuşu	anlam
mir	mır	öldü	mîr	mir	derebey
bir	bır	götürdü	bîr	bir	hafıza
din	dın	diğeri	dîn	din	deli
dil	dıl	yürek	dîl	dil	esir
jin	jın	kadin	jîn	jin	yaşam
hin	hın	kimileri	hîn	hin	daha/ henüz
bin	bın	alt	bîn	bin	koku
riz	rız	pirinç	rîs	ris	iplik

yeniozgurpolitika.org hizmetidir. Kaynak gösterilmeden kullanılamaz.

V v: Türkçedeki “v” gibi okunur.

Örnek: varik (piliç), vala (boş), bav(baba), dev (ağız), van (bunlar)

W w: Bu ses Türkçede yoktur. Dudak “o” sesinde olduğu gibi

yuvarlaklaştırılır, birden açılarak “oue” gibi bir ses çıkarılır. İngilizcenin

“Water” deki “w” sesi, yada arapçadaki “9 “ sesi gibi çıkarılır.

Örnek: War (ouar = yayla), wan (ouan= onlar), wî (oui = o - eril), Wê (ouê = o

– dişil), weris, (oueris = urgan)

X x : Bu ses bir arkadamak sesidir. Damaktaki balgamı çıkarmak için çıkarılan sese benzer. Yani şöyle bir ses “ağhı”

Örnek: xal (ğhal = dayı), xanî (ğhani = ev /bina), xew (ğhew = uyku), xort (ğhort = Genç), xanim (ğhanım = hanım)

Y y: Aynen Türkçedeki “y” gibi okunur. Örnek: yek (bir sayısı), yar (sevgili), Yado (bir kürk kahramanı) yêzdan (Allah /tanrı), yadigar (hediye)

Z z: Türkçedeki “z” sesi gibidir.

Örnek: ziman (dil / lisan), zanîn (bilmek), zarava (lehçe) zava (damat /güvey), zêr (altın)

Xw xw (diftong): Bu çift ses Türkçede yoktur. “x” ve “w” seslerinin beraber okunuşudur. Aşağı yukarı şöyle bir ses “ğhoue”

Örnek :Xwar (ğhouar =yedi), xwendin (ğhouendın = okumak,) xwastin (ğhouastın = istemek)

Lütfen şu aşağıdaki cümleleri alfabeye uygun okuyun. Bunun ardından gazetemizin kürtçe sayfasını doğru okumaya çalışın. Bir de kürtçe iyi bilen bir arkadaşınızla gazetemizin kürtçe sayfasını okuyun. www.welat.org adresinide ziyaret edebilirsiniz.

“v” ile “w” seslerini karıştırmamak için şu tablayi dikkatlice okuyun					
<i>yazılışı</i>	<i>okunuşu</i>	<i>anlam</i>	<i>yazılışı</i>	<i>okunuşu</i>	<i>anlam</i>
vê	vee	bu(dişil)	wê	ouee	o(dişil)
vî	vi	bu(eril)	wî	oui	o(eril)
dev	dev	ağız	dew	dew	ayran
sêvî	seevi	elmamasi	sêwî	seeoui	yetim
bavî	bavi	babadan	bawî	baoui	romatizma
hev	hev	birbirin	hew	heou	hiç
tavî	tavi	sağnak	tawî	taoui	dardağan
rev	rev	kaçış	rewa	reoua	nem/ çığ

yeniozgurpolitika.org hizmetidir. Kaynak gösterilmeden kullanılamaz.

We dît? Wê seva sêvê xwe avêt devê dêwê.

(Gördünüzümü? O(dişil) elma için devin ağzına atladı) Wekî pela hişk ket ber pêlê kefa devê dêw. (Kuru yaprak gibi dêv ağız köpüğünün dalgalarına kapıldı.)

Mîrê min mir, (Beyim öldü) Wî bîr ji min bir, (hafızamı benden aldı)

Vê re dilê min dîl ket, (onunla yüreğim esir düştü) Wî bîr ji min bir.

Cewa cêvî di bin dara tawî ya li keviya deşta kewî de lava kir ji xwedê. (Cewa cêvî kewî ovasının kenarındaki dardağan ağacının altında Allaha yalvardı.)

Kur û Kûçik rûniştin li ber Kuçik, (Oğlan çocuk köpek ile beraber ocağın önünde oturdular.)

Ew gundiye bakur, (O kuzeyli köylü) Ango kurê balkûr, (yani dikkati uzunolanın oğlu)

Bê xurinî wisa mûr (kahvaltısız öyle somurtkan)

Hat wekî gur ji dûr. (geldi kurt gibi uzaklardan)

Tabeladaki okunuş biçimini iyi kavrayın.

yazılışı	okunuşu	anlam	yazılışı		anlam
kuçik	khōçik	ocaklık	kûçik	kuçik	köpek
tu	thō	sen	tû	thu	dut
du	dō	iki	dû	du	duman
kur	khör	oğlan çocuk	kûr	kur	derin
sur/sir	sör	esinti	sûr	sur	sur

yeniozgurpolitika.org hizmetidir. Kaynak gösterilmeden kullanılamaz.

Waneya Yekemîn -1-

- Roj baş,
- Roj baş, roj baş. Tu kurd î?
- Erê, ez kurd im, lê tu?
- Ez jî kurd im. lê ew?
- Ew jî Kurd e.
- Tu, ew û ez, em kurd in.
- Erê em Kurd in.

- Ew kî ne?
- Ew Faris in.
- Aha! Ez, tu, ew, em ew û ?
- Na, ne wisa. Wekî min; ez, tu, ew, em, hun û ew.
- Aha! Hun.

Wateya peyvên kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlami)

wate = anlam

peyv = sözcük / kelime

kurdî = Kürtçe /kürt dili

roj = gün, güneş baş = iyi,

roj baş= tünaydın, merhaba, iyi günler

tu = sen (yalın hal) kurd = kürt,

î = sin (olmak fiilinin ikinci tekil şahıs takısı)

Tu kurd î. = Sen kürtsün

Tu kurd î? = Sen kürtmüsün?

erê = evet

ez = ben (yalın hal)

im = ..im (olmak fiilinin birinci tekil şahıs takısı)

Ez kurd im. = Ben kürdüm.

Lê tu? = ya sen?

jî = de / da

ez jî = ben de

Ez jî kurd im. = Ben de kürdüm.

ew = o, onlar (her iki cins için)

Lê ew? = ya o?

e = ..dir (olmak fiilinin üçüncü tekil şahıs takısı)

Ew jî kurd e. = O da kürttür.

Em = biz (yalın hal)

in = ..üz, ...sunuz, ...dirler (olmak fiilinin ço?ul şahıs takısı)

Em kurd in = Biz kürdüz.

kî = kim

Ew kî ne? = Onlar kim dirler.

Ew faris in. =Onlar farstırlar.

na = hayır (aynı zamanda şimdiki zaman olumsuzluk takısı)

ne = değil (bu geçmiş zaman olumsuzluk takısıdır)

wisa = öyle, böyle, şöyle

Na ne wisa! = Hayir öyle değil!

weki = gibi, benzer, tarzında

û = ve, ile

hûn = siz (yalın hal)

Rêziman (dilbilgisî)

Kürtçedeki “bûn “ (olmak) fiilinin şimdiki zaman çekimi, türkçedeki “olmak” fiilinin çekimine çok yakındır. Sözcüklerin sesli veya sesiz harfle bitimine bağlı. Biz yukarıda sesiz harfle biten sözcüklerle “bûn”fiilinin çekimini gördük. Onu tekrarlayalım.

Kürtçe Türkçe

Ez ... im. Ben ...im.

Tu ... î. Sensin.

Ew ... e. O...dur/dir...

Em ... in. Biz...iz /uz...

Hûn.in. Siz.siniz/ sunuz...

Ew.in. Onlar.dırlar/durlar.

Têbinî(not /dipnot): Kürtçe de “bûn” fiilinin takıları türkçenin tersine sözcükten ayrı yazılır, okunurken bitişikmiş gibi okunur. Ayrıca kürtçedeki “bûn” fiilinin takıları hiç değişmez, zira kürtçede ses uyumu kuralı yoktur.

Mînak (örnek):

Kürtçe Türkçe

Ez kurd im. Ben kürdüm.

Tu kurd î. Sen kürtsün.

Ew kurd e. O kürttür.

Em kurd in. Biz kürdüz.

Hûn kurd in. Siz kürtsünüz.

Ew kurd in. Onlar kürttürler.

Pêhînî (alıştırma):

Siz de şu sözcüklerini “bûn” fiiline, yanı yukarıdaki örneğe uygun çekin. tirk, alman, mêr (erkek), jin (kadın), ciwan (genç), karker (işçi)

2-

- Roj baş

- Roj baş

- Ez Necî me, lê tu?

- Necî! Hiii!

- Erê Necî. "Ez Necî me.

- Ez jî Hêvî me.

- Ez Necî me, tu Hêvî yî

- Ew kî ye?

- Ew Gulê ye.

- Ez gundî me.

- Ez jî gundî me.

- Ew kî ye?

- Ew jî gundî ye.

- Em gundî ne.

- Lê hun çi ne?

- Em bajarî ne?

- Erê, erê, em gundî ne, ew bajarî ne.

- Em gundî ne. Hun bajarî ne.

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlami)

... me = ...im (olmak fiilinin sesli harfle biten sözcüklerden sonra kullanılan birinci tekil şahıs takısı)

... yî = ...sin (olmak fiilinin sesli harfle biten sözcüklerden sonra kullanılan ikinci tekil şahıs takısı)

... ye = ...dir (olmak fiilinin sesli harfle biten sözcüklerden sonra kullanılan üçüncü tekil şahıs takısı)

gundî = köylü

... ne = ...yîz /siniz/ dirler ((olmak fiilinin sesli harfle biten sözcüklerden sonra kullanılan çoğul şahıs takısı)

bajarî = şehirli

Rêziman (dîlbilgisî)

Kurdî tirkî

Ez gundî me. Ben köylüyüm.

Tu gundî yî. Sen köylüsün.

Ew gundî ye. O köylüdür.

Em gundî ne. Biz köylüyüz.

Hun gundî ne. Siz köylüsünüz.

Ew gundî ne. Onlar köylüdürler.

3-

Navê min Sîdar e. Welatê min Kurdistan e. Ez li vir karker im.

Mala min li gund e. Mala min mezin e. Ez zewicî me.

Du zarokên min hene. Navê jina min Delal e. Navê zarokên min Evîn û Pêşeng e. Pêşeng law û Evîn keçik e. Zarok hîn biçûk in.

Pêşeng çar û Evîn jî du salî ye Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlami)

nav = isim / ad

navê min .. =benim adim.

welat = ülke /memleket

li = ...de /da (yer bildiren edet)

vir = bura

li vir = burada

karker = işçi / proleter

Ez li vir karker im. = Ben burada işçiyim.

mal = ev

gund = köy

li gund = köyde

mezin =büyük

Mala min mezin e.= Evim büyüktür.

zewicî = evli

Ez zewicî me.= Ben evliyim.

zarok = çocuk

zarokên min =çocuklarım
hebûn = var olmak
heye = var
hene = vardılar
jin = kadın / esh
navê jina min = eşimin adı
law /kur = erkek çocuk
keç /qiz = kız çocuk
keçik = kız /kızca?ız
hîn = henüz / daha
biçûk /piçûk = küçük
çar = 4 (dört)
du / dudu = 2 (iki)
sal = yıl / sene
sali = yaş / yashında
Pêhînî:

1-

Pirs (soru) bersiv:(cevap)

Navê te çi ye? Navê min e /ye

Navê welatê te çi ye? Navê welatê min..... e /ye

Mala te li ku ye? Mala min li e.

Tu zewici yî ? Erê ez me.

Zarokên te hene ? Erê zarokê min

Navê jina te çi ye? Navê jina min e.

Navê zarokên te çi ne? Navê zarokên mine/ne

2- a - Navê min Sîdar .. . Navê welatê min Kurdistan ..

Ez kurd .. . Tu tirk . ? Em çi .. Em kurd .. Hun alman .. b -...min Sîdar e. ...
kurd im.tirk î. kurd in. alman in.

3- Örneklerden yararlanarak diğer sözcükleri

“bûn” fiilinin çekimine uygun çekin. Mînak:

a) Mêr, Ez mêr im, tu mêr î, ew mêr e. Em mêr in, Hun mêr in, Ew mêr in.

Hesinkar, heval, Baran, xwendekar

b)Hêvî, Ez Hêvî me, tu Hêvî yî, ew Hêvî ye. Em Hêvî ne, hun Hêvî ne, ew Hêvî
ne. Mamoste, bajarî, Suryanî, sêwî, rêwî

Gundê me,

Ez ji gundekî Kurdistan im. Gundê me gundekî biçûk e. Navê wî Sêgir e. Di
gundê me de 25 mal hene. Li gund dibistanek jî heye, lê ne dibistana Kurdan
e, ya Tûrekan e. Li Kurdistanê dibistanên Kurdî tine, Kurdî qedexe ye.

Di gund de xaniyekî min jî heye. Di mala min de sê ode hene. Yek oda razanê,
ya dudyan oda rûniştinê, ya sisyan jî kelingeh (mutfax) e.

Di oda rûniştinê de teregên pirtûkan hene. Hemû tereg tijî pirtûk in. Pirtukên

min wekî dilê min in. Li ba min pirtûk, rojname û kovarên Kurdî jî hene. Ma pirtûkên we jî hene? Eger tine, Pirtukan bikirin û bixwînin. Xwendin tiştekî herî baş e.

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlami)

jî :den/....dan

gundekî : bir köy/gund (köy)+yek (bir)+î (eril çekim takısı)= gundekî

me : bizi /bize/ bizim / biz (bükümlü hal)

gundê me : bizim köy

wî : ona / onu / o (bükümlü hal)

di de : ..de /..da (içinde)

di gundê me de: Köyümüzde /köyümüzün içinde

mal : ev / daire

bist û pênc : 25

hene : vardırlar

dibistan : okul

dibistanek : bir okul

kurdan : kürtler

tirk : türk

tirkan : türkler

Kurdî : kürtçe

qedexe: : yasak

xanî : bina /ev

xaniyekî : bir bina / bir ev

xaniyekî min : bir evim

xaniyekî min jî : bir evim de

heye : var /vardır

sê : 3

yek : 1

du : 2

oda razanê : yatak odası

oda rûniştinê : oturma odası

sisyan : üçüncü /3.

ya : cinsiyet belirleyen ön takı/ bu takı dişiler için dir.

ya sisyan : üçüncüsü

kelîngeh (mutfax) : mutfak

tereg : raf

pirtûk : kitap

teregên pirtûkan : kitap rafları

hemû : hepsî / bütün

tijî : dolu

hemû tereg tijî pirtûk in : bütün raflar kitap(lar)la dolu(dur)

wekî : gibi

dil : yürek/ kalp

ba : yan, yanında /ruzgar

li ba min : yanımda
rojname : gazete
kovar : dergî
ma : soru ön takısı
Ma pirtûkê we jî hene? :Sizin de kitaplarınız var mı?
eger : şayet/ eğer
tine /tine : yok/ yoksa/ yoktur
bikirin : satın alın! (emir)
bixwînin : okuyun! (emir)
xwendin : okumak
tişt : şey
tişteki : bir şey
herî : en /daha
baş : iyi
herî baş : en iyi

2- Dîyalog.

- Roj baş! - Roj baş bira
- Tu baş î? - Sipas, lê tu?
- Ez jî baş im. - Navê te çi ye?
- Navê min Sîdar e. - Lê navê te?
- Cindî ye. - Tu ji ku yî?
- Ez ji gundekî Kurdistan im. -Navê gundê we çi ye?
- Navê gundî me Sêgir e. - Di gundê we de çend mal hene?
- Di gundê me de 25 (bistûpênc) mal hene.
- Mala te heye? - Belê, çavîkî min heye. - Mala wê keçikê li ku ye?
- Çi ji te re? - Hîç! Lê mala wî lawikî?
- Mala wî li bajêr e.
- Pêşeng û Evîn li ku ne? - Ew li der in.
- Ma birçî ne bûne? - Na, wan hîn gava din nan xwarin.
- Wan çi xwarin - Goştê biraştî xwarin.
- Ma me çi kirî? - Hinek goşt jî bidin me.
- Goşt nema. - Êh! Em ê jî nanê tisî bixwin.

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlami)

Sipas : teşekkür
Çi : ne
Te : sen /sana / seni / senin (ikinci tekil şahisin bükümlü hali)
Navê te çi ye? : Adın nedir?
Ku : nere (yer bildirme sorusu ve edatı)
Li ku : nerede / hani
Ji ku : nereden

We : siz/ sizin / size/ sizi
Belê : evet/ tabi
Çavî : göz (oda, cep, çekmece)
Çavîkî : bir göz
Çi ji te re : Sana ne?
Der : dış / dışarı
Li der : dışarda
Birçî : aç
Birçi bûn : acıkmak
Ne : değil (olunsuzluk takısı)
Ez ne birçi me! : Ben aç değilim!
Hûn birçî ne bûne? : Siz acıkmadınız mı?
Gav : adım
Gava : esnasında / momentinde / eğer
Din : diğeri
Xwarin : yemek (fiili)
Goşt : et
Biraştî : kızartılmış / kızlenmiş
Goştê biraştî : kızartılmış et
Kirin : yapmak, etmek
Kirî : yapmış / etmiş
Çi kirî? : Ne yaptı / yapmış?
Min çi kiriye? : Ben ne yapmışım?
Bidin : verin
Nan bidin me! : Bize ekmek verin?
Ma : kaldı (kalmak fiilinin dili geçmiş zaman kökü)
Nema : kalmadı.
Ma ? : .. mi? soru ön takısı
Ma ew kurd e? : O kürt mü?
Ma tu gundî yî : sen köylü müsün?
.ê : .ecek / acak (gelecek zaman yardımcı fiilî „dên“ nin şimdiki zaman kökü kökü)
ez ê bêm : ben geleceğim.
Tisî : yavan / kuru
Nanê tisî : yavan ekmek / kuru ekmek
Bixwin! : yiyin! (yemek fiili „xwarin“ in emir kipi)
Rêziman:
Kişî zamirleri üzerine kısa bilgi:

A - Biz ilk derste birinci çeşit zamirleri gördük. Onlar yalın zamirlerdir. Bu yalın zamirleri tekrarlayalım: “ez, tu, ew, em, hûn, ew” bu yalın zamirler kürtçe de üç önemli görevi üstlenmişlerdir.

- 1–Geçişli geçişsiz bütün fiillerin şimdiki zamanlarının çekiminde kullanılırlar.
- 2 - Geçişsiz fiillerin geçmiş zamanlarının çekiminde kullanılırlar.

Örnek:

şimdiki zaman

geçişsiz :geçişli

Ez diçim.(ben gidiyorum.) :Ez dibêjim. (ben söylüyorum:)

geçmiş zaman

geçişsiz :geçişli

Ez çûm. (ben gittim.) :Min got. (Ben söyledim.)

3 – Gelecek zaman çekimin de de yalın zamirler kullanılır.

Örnek:

Ez ê biçim.(gideceğim) :Ez ê bêjim. (söyleyeceğim)

B- Cînavên tewangî (bükümlü kişi zamirleri):

Yekjimar (tekil) - pirejimar (çoğul)

min - me

te - we

wê - wan

wî -

têbinî (not): Bu ikinci çeşit yada bükümlü kişi zamirleri iki görevi üstlenmişlerdir.

1 – Mülkiyet zamirleri olarak kullanılır.

Örnek:

pirtûka min : benim kitabım / kitabım

keça min : benim kızım /kızım

kurê min :benim oğlum /oğlum

pozê min : benim burnum / burnum

2 – Geçişli fiillerin geçmiş zaman çekiminde kullanılır.

Örnek:

Şimdiki zaman :geçmiş zaman

Ez dibêjim (söylüyorum) :min got. (söyledim)

Ez nan dixwim (ekmek yiyorum) :min nan xwar (Ben ekmek yedim)

Lêkera hebûn (varolmak, malik olmak fiili):

1- var olma. Erênî (olumlu)

Yekjimar Pirejimar

Ez heme (ben varım) :em hene (henin)

tu heyî :hûn hene

ew heye :ew hene

Nerênî (olumsuz)

ez tineme (ben yokum) :em tinene

tu tineyî :hûn tinene
ew tineye :ew tinene

2- Bir şeyin elde bulunması, var olması.

Yekjimar:

Erênî

Nan heye. (ekmek vardır)

Nanekî min heye (Benim bir ekmeğim var.)

Nerênî

a) Nan tine. (Ekmek yoktur.)

b) Nanê min tine. (Benim ekmeğim yoktur.)

Pirejimar:

Erênî

a) Nan hene. (Ekmekler vardır.)

b) Nanên min hene. (Benim ekmeklerim vardır.)

Nerênî

a) Nan tinin. (Ekmekler yoktur.)

b) Nanên min tinin. (Benim ekmeklerim yoktur.)

Têbinî:

Kürtçenin kurmanci lehçesinde yalın halde bulunan kelimeler çoğul takısı almazlar. Kelimenin çoğul oluşu fiilin aldığı çoğul takısından anlaşılır. Örnek olarak ilk cümle olan “Nan hene” cümlesini kelimesi kelimesine tercüme ettiğimizde rahatlıkla anlaşılır.

Örnek:

Yalın hal de kelimesi kelimesine esas anlam

Nan heye. :Ekmek var(dır). Ekmek vardır.

Nan hene. :Ekmek vardılar. Ekmekler vardır

Bükümlü hal kelimesi kelimesine esas anlam

Nanê min heye.: Ekmek benim var(dır) :Benim ekmeğim var.

Nanên min hene. :Ekmekler benim vardılar

:Benim ekmeklerim var.

C) Daçek (Edat):

Di...de(de/da/ bir şeyin içinde anlamındadır. Gözle görülmez) di sandiqê de.
(sandıkta / Sandığın içinde)

di binê kursiyê mezin de, (büyük sandalyenin altında)

di erdê de (yerde /yerin içinde anlamında)

Li ...(de /da / gözle görülür, açıkta anlamlarında)

li ber sandiqê (sandığın önünde/ bakıldığına gözle görülür.)

li ber kursî (sandalyenin önünde)

li erdê (yerde / yerin üstünde, gözle görülür.)

Bu iki edatın daha iyi anlaşılması için bir örnek daha.

Pirtûk di erdê de ye. : Kitap yerde dir (yere gömülü, yerde saklı anlamında).
Pirtûk li erdê ye. : kitap yerde dir. (yerin üstünde, bakıldığında görülür anlamında)

Ji..... : ...den /...dan
Ji Kurdistan. : Kürdistan dan
ji Serhed, : Serhat tan
ji Amed : Amed ten (Diyarbakır dan)

pêhînî 1
- - gundê we - - çend mal hene?
- - gundê me - - 25 (bistûpênc) mal hene.
Pêşeng û Evîn - - ku ne?
Ew - - der in.
Pirtûk - - çaviya sandiqê - ye.
Pirtûk - - ser sandiqê ye.

pêhînî 2

Mînak:
Ev mase - - darê mazî ye.
Ev mase ji darê mazî ye. (Bu masa meşe ağacından)

Ez - - gundekî Kurdistan im
Tu - - ku yî? (nerelisin)
Ez - - Dêrsim im.

pêhînî 3
Boş yerleri şu sözcüklerle doldurun, heye, hene, tine,
Li gund dibistanek jî--,Li Kurdistanê dibistanên Kurdî---,
Di gund de xaniyekî min jî - - - -. Di mala min de sê ode - -
- -. Di oda rûniştinê de teregên pirtûkan - - - -. Li ba min pirtûk,
rojname û kovarên Kurdî jî - - -. Ma pirtûkên we jî - - - -?

ZOZANÊ ME;

Em biharan diçin zozanan. Keç û bûkên gundê me xwe dixemilînîn, li hespan siwardibin û berê xwe didin waran. Kar dikeve ser milên herkesî; şivan berê birên pez didin zozanan, berxivan jî berxan hêdî hêdî ber bi waran dikişînin. Gundî tiştên xwe li ker û hespan bardikin, dibin waran, baran datînin, konan vedigirin, hinek jî çeper û holikan çêdikin.

Roj dibe roja zarokan, ev roj ji bo wan wekî cejn e. Ew gulên pêşerojê dikevin nava mêrgên zozanan, deste deste gul, sosin û beybûnan dibistînin. Dengê

zarokan, kalîna berxan û orîna golikan li hev diqelibin, dibe şadî û dikeve nava waran.

Ber bi nîvro gavan dewaran dajo nava waran. Zarok diçin çêlekan tînin û li ber konan girê didin. Jin, berê golikan berdidin bin mangan û dûv re didoşin. Gava gavan diçe mala xwe, şivan jî pez tîne bêriyê. Bêrîvan eyaşîran dikin tûran, didin piştî xwe, elban davêjin milên xwe, diçin bêriyê û pez didoşin, gava elban tijî dikin, tînin berdî eyaşîran. Li pey dotinê berxivan berxan berdide nav pez. Berx makên xwe dibînin, dikevin bin û dimijîn. Ev jiyan îro jî bo min wekî xewn e.

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlami)

bihar : ilkbahar

baharan : ilkbaharlar /ilkbaharda

çûn : gitmek

Em diçin. : Biz gidiyoruz.

zozan : Yayla

keç : kız

bûk : gelin

xwe : kendi / kendini

xemilandin :süslemek /bezemek

xwe xemilandin : kendini süslemek

Keç xwe dixemilinin : Kızlar kendilerini süslüyorlar.

hesp : at

siwar bûn : binmek

Li hespan siwardibin. : Atlara biniyorlar.

Li ereban siwardibin. : Arabalara biniyorlar.

berê xwe : yönünü

war : yayla

dayin : vermek

didin : veriyorlar

Berê xwe didin waran. : Yönlerini yaylalara veriyorlar.

kar : iş

ketin : düşmek

dikeve : düşer

ser : üst

mil : omuz

kes : kişi

herkesî : her kese

şivan : çoban

bir : sürü

pez : koyun /küçük baş hayvan

birê pez : koyun sürüsü

berxivan : kuzu çobanı

berx : kuzu

hêdî hêdî : yavaş yavaş
ber bi : istikamete / doğru (bir yöne doğru)
dikişine : çekiyor
kişandin : çekmek
tişt : eşya / şey
tiştên xwe : eşyalarını / şeylerini
ker : eşek
bar : yük
barkirin : yüklemek
birin : götürmek
dibin : götürüyorlar
danîn : indirmek
datînin : indiriyorlar
kon : kıldan dokuma çadır
vegirtin : germek/ çadır kurmak.
çeper : çeper
holik : kulube /yayla evi / evcik
çêkirin : yapmak
çêdikin : yapıyorlar
roj : gün
roja : günü
zarok : çocuk
ev : bu
ji bo : için
ji bo wan : onlar için
wekî : gibi
cejn : bayram
ew : o / onlar
pêşeroj : gelecek
nav : iç / içine
mêrg : çayır
deste : deste /buket
sosin : susen (bir çeşit çiçek)
beybûn : papatya
bistandin : dermek / sapıyla koparmak
dibistinin : deriyorlar
deng : ses
kalin : meleme / melemek
orin : böğürme böğürmek
golik : dana
nivro : öğlen / gün ortası
gavan : sığırtmaç / büyükbaş hayvan çobanı
dewar : sığır
ajotin : sürmek
dajo : sürüyor

çêlek : inek
anîn : getirmek
tînin : getiriyorlar
li ber : önünde
girêdan : bağlamak
girêdidin : bağlıyorlar
berê : önce
berdan : bırakmak
berdidin : bırakıyorlar
bin : alt
mange : inek
dûv re /dû re : sonra
dotin : sağlamak
didoşin : sağıyorlar
mal : ev
Gavan diçe mala xwe : sığır çobanı evine gidiyor.
bêrî : koyun sağma yere
Şivan jî pez tîne bêriyê : Çoban da koyunları sağma yerine getiriyor.
bêrîvan : koyun sağan kadın
eyaşir : süt tulumu
tûr : kulplu yünden çanta /torba
dike : yapar
dike tûran : torbaya koyar
pişt : sırt
Dide pišta xwe. :Sırtına alıyor /sırtına veriyor.
elb : ağaçtan kova
avêtin : atmak
davêje : atıyor
milê xwe : koluna
Davêje milê xwe. : koluna atıyor.
diçin : gidiyorlar
tijî : dolu
tijî kirin : doldurmak
tijî dikin : dolduruyorlar
li pey : ardından
mak : anne
dîtin : görmek / bulmak
dibînin : görüyorlar
mîtin : emmek
dimijin : emiyorlar
jiyan : yaşam / hayat
xewn : ruya
di bin darê de : ağacın altında
rûniştin : oturmak
rûdine : oturuyor

firavin : öğle yemeği

xwarin : yemek (fiili) dixwe : yiyiyor

Dema niha (niho, nika)

Türkçe'nin mastar kökü hem şimdiki zaman, hem de geçmiş zaman köküdür.

Örnek: "gitmek" fiilinin kökü "git" dir. "mek" mastar takısıdır. "git" kökü hem şimdiki hem de gelecek zaman kökü olarak kullanılır.

şimdiki zaman :geçmiş zaman

gidiyor :gitti

Kürtçe de mastarlı fiillerin kökü geçmiş zaman köküdür. Bu nedenden dolayı önce şimdiki zaman kökünü bulmak gerekir.

Örnek:"çûn" fiilinin kökü "çû" dür, "n" mastar ekidir, "çû" kökü aynı zamanda geçmiş zaman köküdür.

şimdiki zaman (s.z) :geçmiş zaman

Ez diçim. :Ez çûm

Kürtçede istisnalar hariç şimdiki zaman kökünü bulmanın da bazı kuralları vardır. Kürtçe bilenler emirkiipi vasıtasıyla bulabilirler. Kürtçe'yi yeni öğrenenler ise belki kuralları kavramak zorunda.

1. ci grup "..an, ..ûn, ...în, ...istin, ...irin" ile biten mastarlı fiiller de bu takıları kaldırdığında şimdiki zaman kökü elde edilir.

Örnek: Çûn: "ç – ûn" bû fiilde şimdiki zaman kökü sadece "ç" dir.

Kürtçe'de de türkçe gibi bir şimdiki zaman takısı kullanılır. Türkçe'deki şimdiki zaman takısı "yor" dur. Ve fiil kökünden sonra gelir "geli-yor."

Kürtçedeki şimdiki zaman takısı "di" edatidir. Bu edat fiilin şimdiki zaman kökünden önce gelir "di-ç" fiil çekim esnasında tabii olarak kişi zamirlerinin takılarını da alır.

Têneper

Yekjimar (tekil) :Pirejimar (çoğul)

Ez diçim, :Em diçin

Tu diçî :Hûn diçin

Ew diçe :Ew diçin

"..an, ..ûn, ...în, ...istin, ...irin" ile biten bazı fiillerin şimdiki zaman kökleri aşağıdaki tabelada sıralanmışlardır. Bu fiilleri yukardaki şimdiki zaman örnek çekimine göre çekimi yapın.

Pêhînî (alıştırma): 1

Mînak(örnek)

Hespan, waran =

Li hespan siwarbûn û berê xwe dan waran.

1-Keran, gund 2- Gayan (öküzler), bajar 3-Mangan çıyan, 4-Otobosê, Amaed,

5- Balafirê (uçak), Almanayê.

6- Keştî (gemi), Amêrkayê, 7- Trên, Hewlêrê pêhînî 2

mînak: Elban tijî,, eyaşiran

Elban tijî dîkin, tinin berdidin eyaşiran

Şivan dî bin darê de (rûniştin) û firavina xwe..... (xwarin). Jin berê

golikan (berdan) bin mangan û dûv re (dotin)

Keç û bûk xwe (xemilandin) li hespan(siwarbûn) û berê
xwe (dayin) zozanan.

Gundî tiştên xwe li ker û hespan (barkirin), (birin) waran, baran
(danin), konan (vegirtin),

Eyaşîrên dî tûran de (danin), elban (girtin), (ketin) nav pez û
pez (dotin),

Zarok (çûn), çêlekan(anin) û li ber konan girê (dayin)

Pêhînî 3

Şivan jî rûdine û dixwe Jin golikan berdidin mangan û
... .. didoşin

Keç û bûk ...dixemilînin, .. hespan siwardibin û didin zozanan.

Gundî tiştên ker û hespan bardikin,

Eyaşîrên .. tûran .. datînin, elban digirin, dikevin ... pez

Zarok diçin çêlekan tînin û konan girê didin.

Ev roj wan wekî cejn e.

Berx makên ... dibînin, dikevin ... û dimijin.

Cînava serbixwe /xweger (refleksiv/ dönüşlü zamir)

Xwe

Ez bi xwe, (ben kendim)

ew bi xwe, (o kendisi)

em bi xwe, (biz kendimiz)

hun bi xwe (siz kendiniz)

têbini(not): yukarıda görüldüğü gibi “xwe“ refleksiv zamiri kişilere göre
değişmez, Türkçe’nin tersine sürekli aynı kalır.

Daçek (edat)

Yalın yalın çifte edat

Li ser li ser

Li ber bin dî bin de

Li wir bi bi.....re

Li pey nav dî nav re

Li bin bo ji bo

şu dialogu bir kaç kez okuyun.

- Em biharan diçin seyranê,(geştê)hun çi dîkin?
- Em jî diçin zozanan.
- Hûn li zozanan çi dîkin?
- Em konan vedigirin, holikan çê dîkin.
- Keça te diçe ku?
- Ew diçe bêriyê.
- Lê lawê te?
- Ew diçe zanîngehê
- Tu koçerî?
- Belê
- Pezê we heye?
- Erê.
- Ma zarok dikevin nav mêrgan?
- Belê, ew gulan dibistînin.
- Tu jî gulan dibistîni ?
- Belê ez di wî karî de dixebitim.
- Li mala we elb heye?
- Belê.
- Tu di elbê de pez didoşî?
- Na ez tenê mangan didoşim.
- Hespê te heye?
- Na, hespê min tine.
- Tu li hespê siwar dibî?
- Car caran.
- Eyaşîr çi ye?
- Çermê pez e, mirov şîr, av yan jî dew dikê.
- Berx çi ye?
- Çêlika miyê ye.
- Ma tu jî şivan î?
- Na ez xwendekar im.

<i>mastarî fiil</i>	<i>anlamı</i>	<i>şimdiki zaman kökü</i>	<i>atılan mastar</i>	<i>örnek çekim</i>
dan(dayin)	vermek	d	..an	Ez didim
kolay	kazmak	kol	..an	Ez dikolim
bûn	olmak	b	...ûn	Ez dibim
kirîn	sainalmak	kir	...în	Ez dikirim
birîn	kesmek	bir	...în	Ez dibirim
pirsîn	sormak	pirs	...în	Ez dipirsim
xistin	düşürmek	x	...istin	Ez dixim
birin	götürmek	b	...irin	Ez dibim

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlami)

seyran :gezi gezinti
geşt : gezî piknik
zanîn : bilmek
zanîngeh /zanko :üniversite/ yüksek okul
car : sefer /defa
carcaran /carina : bazen
çêlik : yavru
mî /mîh : koyun
yan jî : ya da
yan yan jî : ya ... ya da
şîr : süt
xwendekar : öğrenci
Rêziman
Hevokên pirsê (soru cümleleri)
Kürtçede üç çeşit soru cümlesi kullanılır

1- Ses tonu ile, bu durumda ilk sözcük ile cümleinin son sözcüğü, ya da son sözcüğün son hecesi vurgulu okunur

Mînakk:

Tu kurd î? (Sen Kürt'sün? /Sen Kürt müsün?)

Tu li hespê siwar dibî? / Sen ata binersin? / Sen ata biner misin?)
Tu di elbê de pez didoşî? (Sen kovada koyun saġar mısın?)
Li mala we elb heye? (Evinizde kova var mı?)
Tu jî gulan distînî ? (Sen de gül alır misin?)

2- Soru takısı “ma” ile soru cümlesi yapılır. Bu soru cümlesinde soru takısı ile cümlelerin son hecesi vurgulu okunur.

:Minak

Ma tu Kurd î? (Sen Kürt müsün?)
Ma tu li hespê siwar dibî?
Ma tu hînê Kurdî dibî? (Sen Kürtçe öğreniyor musun?)
Ma tu jî ji azadiyê hez dikî? (Sen de özgürlüğü sever misin?)

3 – Soru sözcükleri ile soru cümleleri kurulur. Bu durumda soru sözcükleri vurguludur.

Mînak:
Eyaşîr çi ye? (Süt tulumu nedir?)
Kî li hespê siwar dibe? (Kim ata biniyor?)
Tu çima Kurdî nizanî? (Sen neden Kürtçe bilmiyorsun?)
Elb ji bo çi çêbûye? (Kova ne için yapılmıştır?)
Te kijan pirtukê girt? (Sen hangi kitabı aldın?)

Pêhînî

Şu cümleleri soru cümlesine çevirin.

- Ew diçe bêriyê.
- Ew diçe zanîngehê
- Tu koçerî
- Pezê we heye
- Zarok dikevin nav mêrgan
- Ew gulan dibistînin.
- Tu jî gulan dibistînin
- Ez di wî karî de dixebitim.
- Li mala we elb heye.

Wane 4

Vexwendin

Postewan tê, derdixe, nameyeke dide min, ev ji xalê min tê. Ez bi dilhejî vedikim û bi lez dixwînim. Xalê min li Almanyanê dijî, ew min vedixwîne.

Dibêje; “were li vir di zanîngeha Alman de bixwîne. Ez berê radiwestim, difikirim, ramanek tê, ramanek diçe. Ev ji bo min vexwendineke dilhejî ye, mathîstekî dilinî ye. Li welatekî biyanî xwendin, zimanekî biyanî fêrbûn, bêgûman, hem dijwar û hem jî balkêş e. Ez bazdidim, ji diya xwe re mijarê vedibêjim:

“Dayê xalê min min vedixwîne Almanyayê!

Diya min berê kûr dirame, dibêje;

“Na, berxo, na!”

Min diya xwe hembêz kir û got,

“Na dayê, ez naçim, li welatê biyanî naxwînim, dilê diya xwe naêşînim.”

Bevê min bi hêrs;

“Çima naçî, naxwînî, nabî xwediyê pêşeyeke bi nirx?”

Bi rastî ez dixwazim, tenê di ber dilê diya xwe re diçim.

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlamı)

postewan : postacı

tê : geliyor

derxistin : çıkarmak

dedixe : çıkarıyor

name : mektup

nameyeke : bir mektup

xal : dayı

ji xalê min : dayımdan

bi : ile /la,le

dilhejî : heyecan

vekirin : açmak

lez : çarçabuk/ hızlı

xwendin : okumak

dixwinim : okuyorum

jiyan : yaşamak / yaşam

dijî : yaşıyor

vexwendin : davet etmek

vedixwine : davet ediyor

Ew min vedixwine : O beni davet ediyor.

gotin : söylemek

dibêje : söylüyor

were : gel (halk dili)

rawestan : durmak, durup kalmak, dikilmek

radiwestim : duruyorum

fikirandin / ramandin : düşünmek, mutala etmek

difikirim / diramim : düşünüyorum

mathîşt / lalhişt : sürpriz

dilini : duygulu, heyecanlı

Li welatek biyani xwendin : yabancı bir ülkede okumak

biyanî : yabancı
bêguman : şüphesiz
dijwar : zor
balkêş : dikkat çekici, ilginç
Hem dijwar û hem balkêş e. : hem zor hem de ilginç.
bazdan : kaçmak
Ez bazdidim : ben kaçıyorum
mijare : konu
vegotin : anlatmak
Ez mijarê ji diya xwe re vedibêjim. : Ben konuyu anneme anlatıyorum.
kûr : derin
Diya min berê kûr dirama : Annem önce derin dalıyor (düşünüyor)
hembêzkirin : kucaklamak
Min diya xwe hembezkir. : Annemi kucakladım.
êşandin : acıtmak
Dilê diya xwe naêşînim. : annemin yüreğini acıtmam.
pîşe : meslek
nirx : değer
xweiyê pîşeyek bi nirx : değerli bir meslek sahibi
rast : doğru
rastî : doğruluk
di ber dil re çûn : gönlü hoş etmek, gönlünü almak
şu diyalogu birkaç kez okuyun
- Tu diçî zozana?
- Na, ez naçim.
- Tu jî xwe dixemilînî?
- Na, ez wekî we xwe naxemilînim,
- Tu li hespê siwardibî?
- Na, ez li hespê siwarnabim.
- Tu mala xwe bardikî?
- Na, ez mala xwe barnakim?
- Tu bi Îngîlîzî dixwînî?,
- Na, ez bi Îngîlîzî naxwînim.
- Tu stranan dibêjî?
- Na, ez stranan nabêjim

Ez ji telefona destan pir hez nakim. Betlaneyekê du hefteyê hebû, ez jî hatim gund. Mirata telefonê di bêrika min de bi min re hatibû gund. Min sê roj ew girt, lê min ew cardin vekir. Bi vekirinê re hevalê min î Sincar telefon kir.

Em bi telefonê wiha peyivîn.

“Roj baş! Tu li ku yî, lo?”

“Ez li gund im?”

“Tu li wir çi dikî?

“Ohoo çi nakim! Em sibe zû radibin, pismamê min min dibe li çîyan digêrîne. Li pey em kivkarikan dicivînin. Li ser agir kewa dîkin û dixwin. Li pey jî ez diçim, hespê dibezişim. Nîvro jî em bi tevê jinan diçin nav pez, Jin pez didoşin, em dikevin nava mêrgên çolê û Her wiha! Lê tu çi dikî?”

“Ez jî xwe dixemilînim, diçim çarşiyê, awiran direşim ser bedewan, li pey dikevim çayxanê, wê bin û pîxa genî dikişim nava pişik û kezevê.. Êvaran jî li ber televizyonê tiliya xwe dimijim!”

“Ma karê te çi ye? De têra xwe tiliyê bimije.”

“Zû were, min bîriya te kiriye!”

“Ezê demeke kin de li wir bim.”

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlamı)

dest :el

hez kirin : sevmek

hez nakim : sevmiyorum

betlane :tatil

hefteyi :haftalık

hebû :vardı

hatim :geldim

mirat :miras

mirata :miras/ alahın belası

bêrîk : cep

di bêrîka min de : cebimde

bi min re : benim ile

girtin : kapatmak /kapmak

girt : kapadım

vekirin : açmak

vekir : açtım

cardin :tekrar

bi vekirinê re :açmamlı beraber

peyvîn : konuşmak

ku :nere

li ku : neredede

tu li ku yî :sen neredesin?

li wir : orada

oo çi nakim : ne yapmıyorum ki?

zû : erken /çabuk

pismam : emioğlu /amcaoğlu

çiya :dağ
gerandin : gezdirmek
digerine : gezdiriyor.
li pey : ardından
kivkarik : mantar
civandin : toplamak / toplanmak
dicivînin : topluyoruz
li ser : üstünde
agir : ateş
kewa kirin : közlemek
kewa dikin : közlüyoruz
xwarin : yemek
hesp : at
bezandin : koşturmak
nîvro : öğleyin
bi tevê : ile
çol : yaban /kırsal
her wiha : bunun gibi
awir : bakış / gözetiş
reşandin : serpmek
direşinim : serpiyorum
bedew : güzellik
ketin : düşmek
bîn : koku
bin û pix : koku ve dumani
kişandin : çekmek
nava : içine
pişik : akciğer
kezev : karaciğer
êvar : akşam
tilî : parmak
mîtin /mijîn : emmek.
Ma karê te çi ye? : işin ne?
têr : tok, doymuş
de têra xwe : kendine yetecek kadar
De têra xwe tiliya xwe bimije. : Eh! Yeterince kadar parmağını em.
Zu were! : Çabuk gel
bîrî kirin : özlemek
Min bîriya te kiriye! : Seni özledim.
dem : zaman
kin : kısa

Ezê di demekî kin de li wir bim : Ben kısa zamanda orada olacağım.
Rêziman

Biz daha önceki derslerde birinci ve ikinci grup fiillerin şimdiki zaman çekimlerini gördük. Burada da diğer bir grup olan pasif fiillerin, ya da “andin /din” ile biten fiillerin şimdiki zaman köklerini bulma metodunu öğreneceğiz.

Önce “din” takısı atılır, geride kalan fiil kökünün son hecesindeki “a” sesi yumuşatılarak “î”ye dönüştürülür, ortaya çıkan sonuç fiilin şimdiki zaman köküdür.

Örnek: Gerandin (bu fiilde “din” eki atılır, geri kalan “geran”nın son hecesindeki “a” “î”ye dönüştürülür. Ortaya “gerîn” çıkar. Bu şimdiki zaman köküdür.

Şimdi de çekimini yapalım
Gerandin
Ez digerinim Ben gezdiriyorum
Tu digerinî
Ew digerîne
Emdigerînin
Hûn digerînin
Ew digerînin

Sizde yukarıdaki örneğe uygun şu pasif fiillerin çekimini yapın.

1 – civandin, 2 – kişandin, 3 – xemilandin, 4 – reşandin, 5 – bezandin

Pêhînî 1 Mînak:

Ez hez nakim (telefonê) Ez ji telefonê hez nakim.

1 – Ew hez nake (derewan = yalan) 2 – Emhez nakin (zulumkaran)

3 – Tu hez nakî (min). 4 – Hûn hez nakin (me) Pêhînî 2 Mînak:

Min bîriya kiriye(te). Min bîriya te kiriye.

1 – Wî bîriya..... kiriye (min) 2 – Wê bîriya kiriye(diya xwe).

3 – Min bîriyakiriye(bavê xwe). 4 – Wan bîriya kiriye (me).

5 – Me birîya kiriye (welatê xwe).

Pêhînî 3 Mînak:

Ez ...Li wir im (sibe) Ez sibe li wir im.

1 – Emli wir in(êvarê). 2 - Ew li vir in (roja cejnê=bayram günü).

3 – Ew li vir e (pêncşemîyê). 4 – Tu li vir î (kengê=nezaman)?
5 – Ez ... li wir im(sêşemîyê=Salı).

Otobûs Ez li otobûsê siwar bûm, diçim mal. Di otobûsê de tiştên balkêş hene. Yek bi tiliyên xwe dijmêre, yek destê xwe dadilêse. Yek jî porteqalan diqêşere., Dergûşek bi destên xwe yên biçûk çavên xwe ji mêşan diparêze. Li der dinêrim, hin derketine seyranê goşt dibrêjînin. Lê ev tiştên balkêş jî hedana min nayne. Ez stûnên devên rê dijmêrim. Ji bêhedaniya di xew re çûm. Gava ez li qerajê ji otobûsê peya bûm, hevalê min bi hemû hêza xwe ve destê min diguvêşe, ez jî milê wî diguvêşim. Li pey jî em di nava bajêr de digerin. Li her derê tişteki cûda. Cîhan wiha ye.

balkêş : dikkat çekici

jimartin : saymak

dijmêre :sayıyor

dalastin /alastin : yalamak

qêşartin : meyve sebze soymak

dergûş : bebek / beşik

çav :göz

çavên xwe : kendi gözlerini

mêş : sinek

parastin : korumak /savunmak / sözüne sahip olmak

nêrîn : bakmak

deketin : çıkmak

seyran : gezi /piknik

goşt : et

biraştin : kızartmak

hedan : dişlik /oyalanma

nayne : getirmiyor

stûn : direk

dev : ağız

rê : yol

devê rê : yol kenarında

jimartin : saymak

ji bêhedaniyan : sıkıntıdan

xew : uyku

di xew re çûn :uykuya dalmak

peya bûn : inmek

hemû : tüm

hêz : güç

bi hemû hêza xwe ve : bütün gücüyle

guvaştin : sıkmak

mil : omuz /kol

bajar /bajêr : şehir

Di nava bajêr de digerin : şehrin içinde dolaşıyoruz

cûda /cûda : ayrı / başka
tişteki cûda : başka bir şey.
cîhan : dünya

Siz de aşağıdaki tabelede bulunan fiillerin çekimini yapınız					
<i>Fiil</i>	<i>Atılan takı</i>	<i>a:e dönüşümü</i>	<i>Şimdiki zaman kökü</i>	<i>Birinci tekil şahıs çekimi</i>	<i>anlamı</i>
dalastin	tin	da-lês	dalês	Ez dadîlêzim	yalıyorum
hîvastin	tin	hîvês	hîvês	Ez dihîvêsim	dokuyorum
jimartin	tin	jimêr	jimêr	Ez dijmêrim	sayıyorum
guvaştin	tin	guvêş	guvêş	Ez diguvêşim	sıkıyorum
birâştin	tin	birêj	bjrêj	Ez dibirêjim	kızartıyorum
bijartin	tin	bijêr	bijêr	Ez dibijêrim	kızartıyorum
qeşartin	tin	geşêr	qeşêr	Ez diqeşêrim	soyuyorum

Bu küçük anlatım da yapıları birbirine benzeyen fiiller kullanılmıştır.

Bu fiiler de bir grup teşkil etmektedirler. Biz bunlara dördüncü grup fiiler diyoruz. Bu tür fiillerin de şimdiki zaman kökü bir sisteme dayalı.

Örnek: “parastın”

Bu tür fiillerde “tin” takısı atılır, geriye “paras” kökü kalır. Paras kökünün son hecesindeki “a” büküm kuralına uygun “ê” ile yumuşatılır, “s” harfi de biraz tizleşir. Sonuçta bu kök “parêz” kökü ortaya çıkar.

Bu açıklamaya uygun şimdiki zaman çekimi

Parastin

Ez diparêzim

Tu diparêzî

Ew diparêze

Em diparêzin

Hûn diparêzin

Ew diparêzin.

Kural dışı bazı fiillerin şimdiki zaman kökleri aşağıdaki tabelada bulunmaktadır onların çekimini yapın					
Fiil	Şimdiki zaman kökü	Şimdiki zaman takisi	Kişî zamirî takisi	Çekim	anlam
gotin	bêj	di	im	Ez dibêjim	Ben söylüyorum
hiştin	hê	di	im	Ez dihêlim	Ben bırakıyorum
man/mayin	mîn	di	im	Ez dimînim	Ben kalıyorum
hatin	ê	di -t	im- m	Ez têm	Ben geliyorum
anin	în	di- i	im	Ez tînim	Ben getiriyorum

Pêhînî 1

Mînak:

otobûsê tiştên balkêş.

Di otobûsê de tiştên balkêş hene.

1 –bajêr – dikanên mezin. 2 – dibistan mamosteyên baş jî

2 – mal – meywe û sewze jî 4 – li almanyayê – kurd jî

Pêhînî 2

Mînak

Keçik – dest bira parastin.

Keçik bi destan birayê xwe diparêze.

1 – Dergûş – dest – çavên – parastin. 2 – Lawik – destan – serê – parastin

3 – Mirîşk (tavuk) – per – çêlik – parastin

4 – bizin – qiloçên – kara – parastin.

Her tişt ters diçe!

Sîdar kûr kûr diponijî, ez nêzîkê wî bûm û min jê pirsî, ka çi bûye. Wî jî derdê xwe wiha got: “Sala 2005 an li min nehat, hertiştê min ters diçe.

Xwarinê çêdikim, binê beroşê dişewite. Tiştêkê binivîsim, ximav li ser kaxizê belav dibe û bi tevhevî dilewitîne. Pencere digirim cama wê dişkê. Min çendekî destê xwe neda tiştêkî, bê tevger mam, di mal de diketim hundirê dolabê, gava derdiketim der, di nedî de kevir dihat û li serê min diket. Ez pir li ber xwe ketim. Bi qasê hefteyekê baş bû. Min cardin her tişt ji bîr kir, bêhna min vebû.

Rojekê hevalan got, “em biçin kaşokan bajon!” Ez bi kaşokan bi weş hatim, li darê ketim, wek paçekî bi darê ve zeliqîm. Ez bi birîndarî û stûxwar ji wir vegeriyam. Gava xweş bûm, min sêçerx ajot, lastîkê wê teqiya. Li tirimbêla bavê xwe siwar bûm, tirimbêl xirab bû. Ji bo ku tiştêkê nebe, min xwe li

nexweşiyê danî û ez ketim nav nivînan.

Li pey çend rojan dîsa ji mal derketim, çûm, min gog lîst, hevalê min ling avêt ber min, ez li erdê dirêj bûm, bi vê re nav dev û diranên min tije xwîn bû. Roja din ez çûm, li hespê siwar bûm, bi carê ve hespê xwe hilavêt û ez ji ser hespê ketim. Ev çend hefte ne, ti deng tine. Gelo ez ji vê belayê rizgar bûm yan na?”

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlamı)

ponijîn :düşünmek

nêzîk : yakın

ka : hani / hele

lêhatin : uymak

lê nehat : uymadı

2005 :(du hezar û pênc)

xwarin çêkirin : yemek yapmak

beroş : tencere

şewitîn :yanmak

nivisandin :yazmak

ximav : mürekep /boya

belav bûn : dağılmak

tevhevî : tüm, bütün

lewitandin : batırmak

şikandin : kırılmak

çendeki : bir müdet /bir ara

tevger : hareket

hundir : iç /dahiliye

di nedî de : aniden

kevir : taş

li ber xwe ketin : üzölmek / kendî kendine kahırlanmak

ji bîr kirin : unutmak

bêhn vebûn : nefes almak

kaşok : kayak

ajotin : sürmek

paç : bêz / bêz parçası

zeliqîn : yapışmak

Bi darê ve zeliqîm: ağaca yapıştım.

birîndar : yaralı

bi birîndarî : yaralı olarak

stûxwar : boynu bükük

vegerîn : dönmek

xweş bûn : iyileşmek

sêçerx : üç tekerlekli bisiklet

du çerx : bisiklet

teqin : patlamak

tirimbêl : taksi / araba
xira bûn : bozulmak
ji bo ku : ... için
Ji bo ku tişte nebe. : birşey olmaması için
nexweşî : hastalık / hasta
Min xwe li nexweşiyê danî : Kendimi hastalığa verdim.
nivîn : yatak
ketim nav nivînan : yatağa girdim.
dîsa : yine
gog : top
min gog list. : top oynadım.
ling/nig : ayak
Hevalê min ling avêt ber min : Arkadaşım çelme taktı bana.
dirêj : uzun
dirêj bûn : uzamak
Ez li erdê dirêj bûm. : yere uzandım
diran / didan : dış
xwîn : kan
tijî bûn : dolmak
Dev û diranên min tije xwîn bûn : ağızım dışım kan doldu.
dîn : diğer
roja dîn : diğer gün
hilavêtin : hoplamak / sıçramak
ti : hiç
gelo : acaba
rizgar bûn : kurtulmak
Çend pirs;

- 1 – Sîdar çi dike?
- 2 – Di baweriya Sîdar de sala 2005an ji bo wî çawa ye?
- 3 – Gava ximav bela be çi dike?
- 4 – Sîdar di mal de diket ku derê?
- 5 – Hevalê Sîdar ji Sîdar re çi dibêje?
- 6 – Gava Sîdar kaşokê dajo çi tê serê wî?
- 7 – Hesp çi dike?

Kürtçede Türkçenin tersine bir çok edat kullanılmakta. Bu edatlar nesne ve objelerin tarifi, pozisyonlarını belirlemede, hatta kelime bükümlerinde büyük rol oynarlar. Ayrıca birçok fiil de edatlı fiilerdir. Örneğin “eve bakıyorum” cümlesin de ismin “e” hali kullanılarak bir yöne yöneliyor. Bu kürtçede “li” edatı bu erki üstlemektedir. “Ez li malê dinêrim!”

Aşağıdaki edatları tekstin içinde bulun, bir daha cümle ile beraber okuyun.

binê beroşê (tencerenin dibi), li ser kaxizê(kağıdın üzerinde), bi tevhevî

(bütünüyle), bê tevger (hareketli), di mal de (evde),
hundirê dolabê (dolabın içi), di nedî de(aniden), li serê min (benim üstümde),
li ber xwe (önünde), bi weş(suratle), ji mal (evden),
bi kaşokan (kayakla), li darê(ağaca), bi darê ve(ağaca/ ağaca yapışık), ji wir
zivirîm (ordan döndüm). li tirimbêla bavê xwe (babamın taksisine).
ji bo ku tişte nebe (birşey olmaması için), li nexweşiyê danî(hastalığa verdi),
ber min (önümde),
li pey çend rojan(bir kaç günden sonra), bi carê ve (aniden), ji ser hespê (atın
üstünden), ji vê belayê(bu beladan).

Mînak:

Simêl min hatin li (olumsuz), mû poz (di...re) min çûn.

Simêl li min nehat, mû di pozê min re diçe.

1 – Sala 2006 an min hatin li (olumsuz), her tişt min ters çûn.

2 – Hewa welatê biyanî min hatin li (olumsuz), her karê min ters çûn.

3 – Zewac(evlilik) min hatin li (olumsuz), karê min ters çûn.

Pêhînê 2

Şu edatları aşağıdaki cümlelerin boş yerlerine uygun bir şekilde yerleştirin.

Binê, li ser, li pey, ji bo, di ..de – bê, hundirê, li ser, li ber.

1 - - - - beroşê dişewite.

2 Ximav - - - - kaxizê bela dibe.

3 - - mal - - - - tevger dima.

4 Ew dikeve - - - - dolabê.

5 Pere - - - - min tine.

6 - - - - xwe dinêre, lê nabîne.

7 - - - - ku dişte nebe, ji mal dernakeve.

8 - - - - çend rojan, cardin karê wî ters diçe.

Diyalog

Şu diyalogu bir kaç kez okuyun! Eğer olanağınız varsa, kürtçe bilen bir arkadaşla beraber okuyun. Anlamadığınız sözcüklerin anlamını sözlükte bulun ve öğrenin.

- Ew çi bîn e, tê? (o ne koku dur, geliyor)
- Binê beroşê dişewite.
- Çima dişewite?
- Ez nizamim, her tiştê min ters diçe!
- Tu çi dikî?
- Ez bi qelemximavê (dolma kalem) dinivisînim, xwedê bela xwe pê de, dîsa!
- Çi bû, be camêro?
- Ximav (mürekep) li ser kaxizê bela dibe!
- Tu jî hêdî binivîse!
- Na, ne ji wê ye, jixwe her tiştê min ters diçe!
- Tu çima naçî der?
- Ez ditirsim, dibe kevir li serê min bikeve!
- Çima kevir li serê te keve?
- Îsal her tiştê min ters diçe!
- Pencerê veke!
- Na, cam dişikê!
- Tu evîndarê darê yî?
- Na! – Tu çima darê hemêz dikî? – Na, ez darê hemêz nakim!
- Lê ew çi ye? – Ez şemitim, hatim li darê ketim. – Tu gogê dilîzî?
- Na ez nalîzim! – Çima nalîzî? – Heval ling davêjin ber min!
- Wêçaxê biçê li hespê siwar be! – Na, hesp xwe hildavê, paşê ez li erdê

dikevim! – Tu jî pir tirsonekî lo! – Na îsal her tiştê min ters diçe!

Bu cümleleri kürtçeye çevirin

Neden ağacı kucaklıyorsun? Hayır ben ağacı kucaklamıyorum.

Camı aç Hayır ben açmıyorum Sen ata

biniyormusun?

Hayır binmiyorum. Niçin binmiyorsun?

Attan düşerim.

Rêziman

Kürtçede eğer anlam bozulmuyorsa yanyana gelen iki sessiz harften bir tanesi düşer. Örnek: simbêl >simêl, kember >kemer, koçber >koçer gibi. Bazı fiillerde de bu özeliğe uygun olarak sessiz harfler düşmüştürler. Şimdi bu kurala uyan fiillerin şimdiki zaman köklerini bulalım.

Serdan (Ziyaret)

Ez par çûm welat. Em li balafirgeha Frankfurtê li balafirê siwar bûn. Balafir di ser Enqerê re firiya û li balafirgeha Xarpêtê danî. Ez çûm qeraja otobûsan, bi wê dilhejiyê li otobûsa gund siwar bûm û me berê xwe da gund. Rêya gund bi qasê saetek kudand (domand). Dema otobûs li gund rawestiya, ez jê peyabûm. Min tûr û baholên xwe girt û xwest ber bi mal biçim. Lê bav û dayîka min hatin pêşiya min.

Min tûr û bahol avêtin û ber bi wan bazda, min berê bi hemû hesreta dil dayika xwe ya delal hemezki û destê wê paçîkir. Hima li pey min bavê xwe hemêzki û destê wî jî paçîkir. Me li hev pirsî û hêsirê şahiyê rijand. Di wê kêliyê de birayê min ê biçûk jî hat. Min ew berê di hemêza xwe de guvaşt û dûv re jî herdu çavên wî yên reş paçîkir. Birayê min tûr û baholên min hilgirt û em çûn mal.

Min çavên xwe li malê gerand, hîn gişt wekî berê bû, tişteke neguherîbû. Dayê mînder danî, em rûniştin, me hinek henek û yarî kir. Bi carê ve xwişka min a biçûk, şîrîna mala me jî, ket hundir. Me hevdu hemêzki, bi dilşadî li hev pirsî. Xwişka min a delal ji me re nan û çay çêkir, anî; me nanê xwe xwar, çaya xwe vexwar. Xwişka min elb avêt pîlê xwe û em bi hev re çûn nav mangan, bi gotineke din nav çêlekan, Me çêlek dotin, anî, keland, hinek vexwar û hinek jî meyand, kir mast.

Fêrgîn Balyan

çûm : gittim
par : geçen sene
balafirgeh : hava alanı
balafir : uçak
li ser, di ser...re : üzeri, üzerinden
Xarpêt : Harput / Elazığ
qeraj : otogar
otobûs : otobüs
dilhejî : heyecan
qasê : kadar
bi qasê : takriben, kadar
bi qasê saetek : takriben bir saat
kudandin : sürmek (zaman için)
kudand / domand : sürdü
Bi qasê saetek kudand : Takriben bir saat sürdü.
rawestan : durmak / dikilmek
rawestiya : durdu
peya bûn : inmek
peya bûm : indim.
bahol : bavul
girt : aldım
xwast : istedim
biçim : gideyim
dayîk : anne
pêşî : ön

Lê bav û dayika min hatin pêşiya min : Ama baba ve anem beni karşıladılar.

avêtin : atmak
min bazda : koştum

Min tûr û baholên xwe avêtin û ber bi wan bazda. : Bavul ve çantalarımı atım,
ve onlara doğru koştum.

hemû : tüm
hesreta dil : gönül hasreti ile
delal : nazlı / iyilerin iyisi
hemêz kirin : kucaklamak
hemêz kir : kucakladım
paçî kirin / maç kirin : öpmek
li hev pirsîn : birbirinin hatırını sormak
hêsir / rondik : gözyaşı
şahiyê : sevinç
rijandin : dökmek
rijand : döktü

Me hêsirê şahiyê rijand : Sevinç gözyaşlarını döktük.
kêlî : an, moment, dakika
di wê kêliyê de : o sırada, o anda
piçûk/ biçûk : küçük
guvaştin : sıkmak
Min guvaşt : ben sıktım
herdu : her iki
reş : kara
herdu çavên wî yên reş : her iki kara gözlerini
hilgirtin : kaldırmak, sırtına almak
hilgirt : kaldırdı.
gerandin : dolaştırmak
gerand : dolaştırdım.
Min çavên xwe li malê gerand : Evde göz gezdirdim.
gişt : hepsi
Gişt wekî berê bû :Hepsi eskisi gibi idi.
guhertin : değiştirmek
Tiştê neguherî bû : Hiç bir şey değişmemişti.
Dayê mînder danî : Anne minderini indirdi.
Em rûniştin : Biz oturduk.
hinek : biraz
henek / yarî : şaka / yarenlik
bi carê ve : birden
xwişk /xweh : bacı / kızkardeş
ket : düştü
ket hundir :içeri girdi, içerisine düştü
hevdu (hev û din) : birbirini
me hevdu : biz birbirimizi.
dilşadî : yürek / gönül sevinci
anî : getirdi
xwarin : yemek (fiili)
vexwarin :içmek
Me xwar û vexwar : Biz yedik ve içtik.
pîl : kol
bi hev re : beraber
avêtin : atmak
Avêt pîlê xwe : koluna attı /aldı
gotin : (burada) söz
bi gotinekî din : başka bir söz ile
dotin : sagmak
kelandin : kaynatmak
Me keland : biz kaynattık.
meyandin : mayalamak
Me meyand : biz mayaladık.
mast : yogurt

Rêziman (dilbilgisi)

Biz daha önce şimdiki zamanı gördük. Bu derste de geçmiş zaman çekimlerini öğreneceğiz. Her şeyden önce iki önemli noktayı açıklamamız gerekiyor. 1 – Daha önce de söylemiştik, kürtçede mastarlı fiillerin kökü geçmiş zaman köküdür. Sondaki mastar takısı atıldığında, geçmiş zaman kökü kalır.

İkinci önemli nokta da kürtçede geçişli ve geçişsiz fiiller geçmiş zaman çekimi esnasında birbirinden ayrılırlar.

a) Geçişsiz fiillerin bütün geçmiş zamanlarının çekimi yalın haldeki kişizamirleri ile çekilir.

Örnek : Dema bori ya têdayî (dili geçmiş zaman) çûn (çû - n)

Siz de yukarıdaki çekime uygun olarak aşağıdaki geçişsiz fiillerin çekimini yapınız.

Hatin, rawestan, rûniştin, ketin, siwar bûn, man Bazı fiillerin uzun ve kısa olmak üzere iki çeşit çekimleri var. Bunu kavramak için aşağıdaki tabelayı dikkatlice inceleyiniz. (1)

Sen de şu fiillerin çekimini örnek çekime göre yap.

Helîn (erimek), qêrîn (bağırarak), kenîn (gülmek), girîn (ağlamak)

b) Geçişli fiillerin geçmiş zaman çekimi bükümlü kişi zamirleri ile çekilir.

Dema borî ya têdayî (dili geçmiş zaman)

1 – Mastarı yalnız “n” olan fiillerde “n” mastar takısı atılır, geriye geçmiş zaman kökü kalır.

Örnek :

dan da

Min da. (Ben verdim.)

Te da.

Wî da. (O verdi. « eril »)

Wê da. (O verdi. « dişil »)

Me da.

We da.

Wan da.

Verdiğimiz örnekte de görüldüğü gibi, geçişsiz fiiller obje ile birlikte kullanılmadığı müddetçe kişi takılarını almazlar. Obje ile birlikte kullanıldıklarında da, obje çoğul ise, fiil de ileride göreceğimiz kürtçeye has bir form olan ergative uygun olarak çoğul takısını alır.

Sen de şu fiillerin dili geçmiş zamanını çek.

Danîn, pirsîn, anîn, kirîn,

2 – Mastarı “in“ olan fiillerde “in“ mastar takısı atılır, geriye geçmiş zaman kökü kalır.

Örnek :

Girtin girt

Min girt.

Te girt.

Wî girt.

Wê girt.

Me girt.

We girt.

Wan girt.

Sen de aşağıdaki fiilleri yukardaki dili geçmiş zaman çekimine uygun çek.

meyandin, dotin, dîtin, domandin, kudandin, xwestin, xwarin,

vexwarin, gerandin, rijandin, avêtin, guvaştin, rijandin.

Nerênî =olumsuzluk.

Kürtçede bütün geçmiş zamanlar için “ne“ olumsuzluk ön takisi kullanılır.

Têneper = geçişsiz

Erênî nerênî

Ez keniyam. Ez nekeniyam.

Tu keniyayî. Tu nekeniyayî.

Ew keniya. Ew nekeniya.

Em kenian. Em nekenian.

Hûn kenian. Hûn nekenian.

Têper = geçişli

Erênî nerênî

Min pirsî Min nepirsî.(Ben sormadım.)

Te pirsî. Te nepirsî.

Wî pirsî. Wî nepirsî.

Wê pirsî. Wê nepirsî.

Me pirsî. Me nepirsî.

We pirsî. We nepirsî.

Wan pirsî. Wan nepirsî.

Bajarê me

Gund piçûk e, bajar mezin e. Gundê me gundekî biçûk e. Li gund dukan tine, gundî diçûn bajêr, li wir tişt û mişt dikirîn. Gava gundî ji bajêr vedigeriyan, em zarok diçûn pêşiya wan, wan jî şekir didan me. Gava ez hîn li gund bûm, min tim dixwest ez biçim bajêr. Ez cara yekem bi bavê xwe re çûm bajêr. Bavê min hinek pere dabû min, min bi wî pereyî ji xwe re bestenî kirîbû.

Ji bajarê me re Depê (Karakoçan) dibêjin. Sînameya bajarê me biçûk bû. Heroj film tinebû, carina fîlm hebûn. Min tenê sê caran li wê sînameyê fîlm sêrkir. Di fîlmeke de hirçê para berda yekî, ew jî ji tirsan bi darê ve hilkişiya, hespê wî jî ji tirsê hirçê bi zîn û bar ve çû. Qeraja bajêr jî wêçaxê biçûk bû. Gava min bajarên din dît û bi şûn ve hatim bajarê Depê, min xwe bi xwe got;

“hey bajaro tu çima wiha biçûk î?” Min ji qeraja bajêr re jî wiha got; “hey qerajê qerajên bajarên mezin, mezin bûne, navên ewropî girtine, bûnin otogar, tu çima hîn qeraj î?”

Bi rastî ew biçûk jî be, her tişt lê tinebe jî, ez bîriya bajarê xwe dikim, ez ji bo wî helbestan dinivîsînim. Di xewn û xeyalên min de ew heye. Ezê rojekê cardin biçim wir û bêjim: “Bajaro! Tu bajarekî biçûk, lê xweşik î, jiyan bê te nabe!”

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlami)

tişt û mişt : şeyleri, eşya ve benzer şeyleri

gava : ...iken, eğer, ...diğinde

bestenî : dondurma

bi wî pereyî : o para ile

kirîbû : satın almıştım

ji bajarê me re : şehirimize

heroj (her + roj) : her gün

tenê : yalnız, tek başına

sêr kirin : seyretmek

hirç : ayı

hilkişîn : tırmanmak, çekilmek

bi darê ve : ağaca

bi .. ve : bu edat(ilgeç) bitişik anlamını verir.

zîn : eyer

Hesp bi zîn û bar ve çû. : At eyer ve yük ile gitti.

qeraj : garaj, otogar

wê çaxê : o zaman

bi şûn ve : geriye, arka üstü

xwe bi xwe : kendi kendine

Ewropa : Avrupa

ewropî : avrupalı

bi rastî : doğrusu

bêrî kirin : özlemek

helbest : şiir

xewn : rüya

Biz bu derste ismin hallerini ve isim tamlamasını göreceğiz. Bütün dillerde en karmaşık dilbilgisi bölümü ismin halleridir. Bunları kavramanın en doğru yolu her dili o dilin mantığı içinde kavramaktır. Kürtçede bu konuda kendine has özelliklere sahiptir.

A – yaşıyan isim halleri

1 – Tewîneka xwerû = Yalın hal (nominativ)

Konuda kullanılan şu sözcükler yalın halde bulunmaktadır.

Gund

Gund biçûk e.

Bajar

Bajar mezin e.

dukan

Li gund dukan tine.

Kısacası cümle içinde hiç bir değişime uğramayan sözcükler yalın haldedir.

2 – Tewîneka tewandî = bükümlü hal (Akkusativ) bu kimi zaman Türkçenin “i” kimi zaman de “a” halerine deng düşer.

a) Kürtçede yönelim içeren cümlelerde bükümlü hal kullanılır.

Örnek:

dar darê

Ew darê dikire. = O ağacı satın alıyor.

Ew darê dibîne. = O ağacı görüyor.

Ew av dide berxê. = O kuzuya su veriyor .

Ew diçe malê = Eve gidiyor.

b) Bükümlü halin kullanımında eril sözcüklerin son hecesi “a” harfini içeriyorsa bu harf genellikle yumuşatılarak “ê” ye dönüştürülür.

Örnek

bajar bajêr

Gundî diçûn bajêr

welat welêt

Ez isal diçim welêt.

aş êş (değirmen)

Bavê min işev diçe êş.

c) Yine “i” halindeki eril sözcüklerde büküm takısı düşer.

Örnek:

Eril

esas durum takısız ve günlük kullanılan

Ez nanî dixwim. Ez nan dixwim (Ekmeği yiyorum.)

Ez kevirî dibînîm. Ez kevir dibînîm. (Taşı görüyorum.)

Ez bang Sîdarî dikim. Ez bang Sîdar dikim.

(Sîdar’ı çağırıyorum.)

Ez dîkî difiroşim. Ez dîk difiroşim. (Horozu satıyorum.)

Dişil

Sürekli büküm takısı ile kullanılır.

Ez sêvê dixwim. (Ben elmayı yiyorum.)
Ez darê dibînîm. (Ben ağacı görüyorum.)

3 – Tewîneka peywendî = İsim tamlaması (genitiv) Kürtçede Türkçenin tersi önce tamlanan, sonra tamlayan gelir.

Örnek

baxçê Sîdar = Sîdar'ın bahçesi
mala Sîdar = Sîdar'ın evi

binavkirî = belirli

keça Fatmayê (dişil) = Fatma'nın kızı
kurê Fatmayê (eril) = Fatma'nın oğlu

Sînameya bajarê me biçûk bû. (dişil)
Şehirin sinemasi küçüktür.
Qeraja bajêr jî wê çaxê biçûk bû. (dişil)
Şehirin otogarı ozaman küçüktü.
Bavê min hinek pere dabû min. (eril)
Benim babam bana biraz para vermişti.

Nebinavkirî = belirsiz

Kürtçede belirsiz tamlama şu formüle göre yapılır:
Tamlanan sözcük+bir sayısı+cinsiyet takısı =belirsiz
mal + (yek) ek+ e (dişil) = maleke
baxçe + yek + î (eril) = baxçeyekî
maleke Sîdar (dişil) = Sîdar'ın bir evi
baxçeyekî Sîdar (eril) = Sîdar'ın bir bahçesi
keçeke Fatmayê (dişil) =Fatma'nın bir kızı
kurekî Fatmayê (eril) = Fatma'nın bir oğlu
Gundê me gundekî biçûk e.(eril) =Bizim köyümüz küçük bir köydür.
Di fîmekî de hirçê para berda yekî = Bir filmde, ayı birini kovalıyordu.
Ezê rojekê cardin biçim wir .
= Bir gün bir daha oraya gideceğim.
Tu bajarekî biçûk î! = Sen küçük bir şehirsin.

çoğul

baxçeyên Sîdar = Sîdar'ın bahçeleri
malên Sîdar = Sîdar'ın evleri
keçên Fatmayê = Fatma'nın kızları
kurên Fatmayê = Fatma'nın oğulları

Min bajarên din dît. = Ben diğer şehirleri gördüm.
Qerajên bajarên mezin, mezin in. = Büyük şehirlerin garajları büyüktür
Wan navên ewropî girtine. = Onlar avrupayı isimler almışlar.
Di xewn û xeyalên min de ew heye. = Rûya ve hayellerimde o var.

4 – Tewîneka bangê (vokativ) = Çağırma hali

Bu hal birçok dilde herhangi bir anlam ifade etmez. Kürtçede canlı bir şekilde kullanılmaktadır.

Eril sözcüklerin sonuna “o” harfi, dişil sözcüklerin sonuna “ê” çoğul halinde ise “ino” getirilerek yapılır.

Örnek:

yekjimar = tekil

Kur Kuro! = Hey oğlan çocuk!

Keç keçê = Hey kız çocuk! Gını! Kızzz!

Pirejimar = çoğul

Kuran kurino = Hey oğlan çocuklar! Oğlanlar

Keçan Keçino = Hey kızlar!

“hey bajo!”

“hey qerajê!”

B – Sözcükler cümledeki yere göre de “e” (dativ) halinde bulunabilirler.

Örneğin sözcük fiilden sonra kullanıldığında “e” (dativ) halinde olur.

Min nan da wî. = Ben ona ekmek verdim

Min sêvekê da Bêrîvanê. = Bêrîvan’a bir elma verdim.

Ez hêdîka ketim odeyê. = Yavaşça odaya girdim.

alîkarî kirin = yardım etmek.

Min alîkariya xortan kir. = Gençlere yardım ettim.

Ez qêriyam ser wan = Onlara bağırdım./Onların üstüne bağırdım.

C – Edatlar yardımıyla yapılan isim halleri

Kürtçede birçok edatın kullanıldığını gördük. Bu edatlardan bazıları eski dilde isim hali takıları olarak da kullanılıyordu. Halen de bazı İrani dillerde kullanılıyor.

1 – Tewîneke jêve (ablativ) = Ismin ..den hali

a) En eski edatlı hal ji do ve = dünden (beri)

Ez ji do ve li vir im. = Ben dünden beri buradayım.

Ew ji dê ve birayê min e. = O anneden kardeşimdir.

Ev ji bin ve şaş e. = bu dipten yanlıştır.

Ew ji serî (xwe) ve dîn e. = Bu kafadan delidir.

Divê ev xanî ji nû ve were lêkirin = Bu ev yeniden yapılmalı.

b) “ji”Edatı ismin “..den” hali görevini üstlenmiştir.

Ew ji mal tê = O evden geliyor.

Ev mase ji mermer e. = Bu masa mermerdendir.

2 – Jê re (dativ) ismin “e” halinin ikiz edatlarla yapımı.

a) eski dativ yada “e” hali

ji.....re = ...e, ...a / için

Ji min re = bana / benim için

Ji te re = sana /senin için

Ji wî re = ona / onun için (eril)

Ji wê re = ona /onun için (dişil)

Ji me re = bize /bizim için

Ji we re = size /sizin için

Ji wan re = onlara /onlar için

Cümle içinde

Wî ji min re got. = O bana söyledi.

Wê ji malê re xalîçe kirî. =O eve (ev için) halı satın aldı.

Ji bajarê me re Depê dibêjin. = Şehrimize Depê diyorlar.

Min ji qeraja bajêr re jî wiha got. = şehir garajına (için) şöyle dedim.

Pêhînî:

Mînak:

Min, wî, pirtûk, kirîn

Min ji wî re pirtûk kirîn.

1 – Bav, zarokan, meywe kirîn.

2 – Min, keçik, sol kirîn.

3 – Zarokan, min, fanêre, kirîn.

4 – Min, bavê xwe, sako, kirîn.

b) Yönelim durumunda ise “li” edatı, ya da adetli fiiller kullanılır.

Örnek:

mêzekirin li (lê mêzekirin)

Ez li malê mêze dikim. =Eve bakıyorum

nêrîn li (lê nêrîn)

Ez li kulilkê dinêrim. = Çiçeğe bakıyorum.

3 – Eski refakat formu da şimdi edatlar vasıtasıyla yapılır.

a) Yan yana olma durumunda

bi re

Ez bi Sîdar re digêrim = Sîdar ile geziyorum.

Ez bi birayê xwe re diçim bajêr = Kardeşim ile şehire gidiyorum.

Canî bi hespê re çû. = Tay at ile gittî.

b) Bitişik durumda

Örnek:

Pisîk bi darê ve hilkişiya. = kedî ağaca tırmandı.

Hesp bi zîn ve çû. = At eyerle gitti.

Bûk bi dergûşê ve çû. = Gelin bebek ile gitti.

Pêhînî 1

Mînak:

Gund, dukan, nebûn, çûn, bajar Li gund dukan tine, gundî diçûn bajêr,

1 – mal, nan, nebûn, Sîdar, çûn firin.

2 - mal, pere, nebûn, Dîlber, çûn, banq.

3 – Mal, av, nebûn, keç, çûn, kanî.

4 – Tûtina kalo, nebûn, em, çûn cîran.

Dialog

Roj baş! Tu bajarî yî, yan gundî yî?

Ez gundî me.

Gundê we mezin e, yan bajarê we?

Bajar mezin e. Gundê me gundekî biçûk e.

Li gundê we dukan heye?

Na li gund dukan tine.

Wê çaxê gundî li ku tişt û miştên xwe dikirin?

Gundî diçûn bajêr, li wir tişt û mişt dikirin.

Wê çaxê te dixwest ku tu biçî bajêr?

Belê! Gava ez hîn li gund bûm, min tim dixwest ez biçim bajêr.

Tu cara yekem kengê û bi kê re çuyî bajêr?

Sal nayê bîra min, lê ez baş dizanim ku ez cara yekem bi bavê xwe re çûm bajêr.

Te li bajêr çi kir?

Bavê min hinek pere dabû min, min berê bi wî pereyî ji xwe re bestenî kirîbû.

Dû re li nav bajêr geriyam.
Navê bajarê we çi ye?
Ji bajarê me re Depê dibêjin.
Tu niha bêriya bajarê xwe dikî?
Hem jî çawa! Tim dibêjim:
“Tu bajarekî biçûk, lê xweşik î, jiyan bê te nabe!”

Şu cümleleri kürtçeye çevirin.

Şehrin sineması küçüktür.
Hergün film yoktu, sadece bazen vardı.
Bir filmde ayı birini kovalıyordu.
Oda korkudan ağaca tırmandı.
Hey şehir sen niye böyle küçüksün?
Büyük şehirlerin garajları Avrupayı
isimler alıp otogar olmuşlar.
Ben onun için şiir yazıyorum.
Rüya ve hayallerimde o vardır.

HESRETA WELAT

Gava ez hîn li gund bûm. tim li wan çiya û banîyên li dora gund digeriyam.
Min ji wan avên zelalên wek şîrê pêşîrên dayîkan vedixwar, ew hewa ji bêhna
sosin û beybûnên zozanan xwe guherandibû mîsk û amberê dikişand nav pişik
û kezevê. Belê, mehê carê jî diçûm bajêr.

Gelek caran cîranên me dihatin, em di binê siya daran de rûdiniştin, diketin
nav mijûliyan. Car caran jî hevalek dengxweş dest davêt kerika gohê xwe,
dilorand û stranên li ser dilan ji me re distira.

- Gava tu li ku bû?
- Gava ez li gund bûm.
- Ha li gund! Baş e, ê te çi dikir?
- Ez diçûn, derdiketim serê çiya û baniyan.
- Te li dûmena gundê xwe dinêrî?
- Na, li xweşiya xwezayê sêrdikir.
- Te jî stran digotin?
- Eh min jî hinek dilorand.

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlamı)

banî = dam üstü
zelal = berak
pêşîr = göğüs/ kadın memesi
beybûn = papatya

pişik = akciğer
kezev = karaciğer
mijûlî = muhabet/ uğraşı
dengxweş = güzel ses
kerik = kulağın iç kısmı

Rêziman

Dema bori 2 / çîroka dema borî(durativ)= 2. geçmiş zaman, yada şimdiki zaman hikayesi.

Kürtçe'de de Türkçe gibi şimdiki zaman takısı geçmiş formu ile birlikte kullanılıyor. Bu form özellikle geçmiş zaman içinde sık sık tekrarlanan eylemleri dile getirmek için kullanılır.

Bu zamanın bileşimi.

a) têper (geçişli fiiler)
Şimdiki zaman takısı + geçmiş zaman kökü
Di + got
Min digot = Ben söylüyordum.

Çekim

Olumlu - olumsuz

Min digot. - Min nedigot.* (ben söylemiyordum.)
Te digot. - Te nedigot.
Wî digot. - Wî nedigot.
Wê digot. - Wê nedigot.
Me digot. - Me nedigot.
We digot. - We nedigot.
Wan digot. - Wan nedigot.

*Şimdiki zamanın aksine, bu ikinci geçmiş zamanda olumsuzluk şimdiki zaman takısı ile birlikte kullanılır.

Têneper = geçişsiz fiil
şimdiki + geçmiş + kişi zamiri
zaman takısı - zaman kökü - takısı
di + kenîya + im
Ez dikeniyam = Ben gülüyordum.

Erênî - nerênî.

Ez dikeniyam. - Ez nedikeniyam.(Biz gülmüyorduk)
Tu dikeniya(yî). - Tu nedikeniya(yî).
Ew dikeniya. - Ew nedikeniya.
Em dikeniyân. - Em nedikeniyân.
Hûn dikeniyân. - Hûn nedikeniyân.
Ew dikeniyân. - Ew nedikeniyân.

İşlediğimiz konuda kullanılan bu şimdiki zaman hikayesini bir daha okuyalım.

Ez li dora gund digeriyam. = Ben köy etrafında geziyordum.

Min avên zela vedixwar. = Ben berak suları içiyordum.

Min ew hewa dikişand nav pişikê. = Ben o havayı ciğerlerime çekiyordum.

Ez mehê carê jî diçûm bajêr. = Ayda bir şehire gidiyordum.

Cîranên me dihatin. = Komşularımız geliyordu.

Em di binê siya daran de rûdiniştin. = Biz ağaçların gölgesinde oturuyorduk.

Baş e, lê te çi dikir? = Güzel, ya sen ne yapıyordun.

Ez diçûn, derdiketim serê çîyan. = Ben gidiyordum, dağlara çıkıyordum.

Sen de bu cümlelerdeki fiillerin çekimini şimdiki zaman hikayesi formuna uygun çek.

Pêhînî 1 Mînak:

(Dema) welat, bûn, pirtûk, xwedîn.
Dema ez li welat bûm, min pirtûk dixwend.

- 1 – (gava) gund, bûn, çîyan gerîn.
- 2 – (gava) ciwan, bûn, stran gotin.
- 3 – (dema) ciwan, bûn, xwe cîhan, din dîtin.
- 4 – (gava) etar (çerçî), hatin, gund, pir tiaht firotin.

Pêhînî 2 Mînak:

- Do tu li mal bûyî? Na, ez do ne li mal bûm.
- 1 – Teşî di ciwantiya xwe de stran digotin?
 - 2 – Tu jî li çiya û baniya digeriyayî?
 - 3 – Ma cîran dihatin mala we?

- 4 – Hûn jî di bin daran de radibûn govendê?
5 – Ma we li welat bi kurdî dixwend?

Şu cumleleri Kürtçe'ye çevirin.

Ben köyde iken, köyün etrafında dolaşıyordum.
Ben o anne memesindeki ak süt gibi berrak sulardan içiyordum.
Ayda bir şehire gidiyordum.
Çoğu zaman komşularımız geliyordu, biz ağaçların gölgesinde oturuyorduk.
Ben gidip dağ ve tepelerin üstüne çıkıyordum.
Hayır, doğanın güzelliğine bakıyordu.
Eh! Ben de biraz mırıldanıyordum.

BELENGAZ

Dibêjin; hebûye tinebûye Belengazekî xwedê hebûye. Qet tişteki wî tinebûye.
Biharan pel û pincar civandiye, xwariye; zivistanan jî derketiye nêçîr û seydê.

Gava belengazê xwedê rojek ji rojên zivistanê dîsa derketiye nêçîrê,
kêvroşkeke belekê rindik ji bin zinarekî wek derba fiştoqê fîjiqiye û bi weş
bazdaye. Wî jî serî daye ser. Nêzîka tarî têkeve erdê, pê girtiye. Di wê kêliyê de
kêvroşk lê hatiye ziman û gotiye: “Min mekuje, ez ne kêvroşk im, ez keça
paşayê periyên im.”

Her çendî qure qura zikê belengazê xwedê jî bûye, wî ew kêvroşk berdaye. Bi
pel û gihayên li ber lat û zinaran zikê xwe têrkiriye. ji ber ku pir westiyaye,
hima li wir di xew re çûye.

Xewneke gelek xweş dîtiye, di xewna xwe de çûye mala bavê kêvroşkê.
Kêvroşk jî bûye keçekê delal, xwe bi awayekî gelek xweşik xemilandiye, hatiye,
bi destê wî girtiye û wan bi hev re berê xwe dane tirîjê rojê, bûnin zirnixek ji
tirîjê rojê, bi rojêre helyane û firyane.

- Tu dizanî çi bûye? - Na! Çi bûye?
- Dibêjin erd hejyaye! - Na lo! Kê got.
- Min jî radyoyê bîhîst.
- Kamo miriye - Na lo! Kê ji te re got.
- Memo got. - Kengê miriye?
- Du roj berê.
- Pêê! Berf bariye!.. - Law çi ecêv e. hîn hetanê nivê şevê jî her der çîk sayî bû
- Him jî her der girtiye.

Halk arasında masal anlatılırken genellikle “hebû tunebû” formu kullanılır.

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlamı)

hebûye : varmış
tinebûye : yokmuş
belengaz : fakir, zavalı
xwedê : Allah, tanrı.
pel : yaprak
pincar : pancar
nêçîr : av, avcılık
kêvroşk /kerguh : tavşan
zinar : kaya
derb : mermî, darp
fiştoq : Havai fişek patlayıcısı/ fırlatıcısı
fijîqîn : çok hızlı bir şekilde fırlamak.
weş : hiz, surat
nêzîkê tarî têkeve ewrdê : yere karanlığın çöküşüne yakın
her çendî : her nekadardır
xewn : rüya
westîn : yorulmak
westiyaye : yorulmuş
awayek : bir biçim de, birşeyler yapma
tirîj : ışın, güneş ışını.
zirnix : zere, zerecik

Rêziman

Biz bu derste de üçüncü geçmiş zamanı, yada mişli geçmiş zamanı göreceğiz. Bu zaman genellikle ikinci kişi tarafından kullanılır, yada hatırlanmayan, kesin bilinmeyen zaman dır. Bu fransızcanın “passe simple”, almancanın “konjunktiv perfek” zamanlarına denk düşer.

Bu konuyu anlamak için tekstin sonundaki kısa dialogları birdaha okuyun!

a) Lêkerên têneper (intransitiv) = geçişsiz fiiller.

Erênî nerênî
Ez ketime. Ez neketime (ben düşmemişim)
Ti ketiyê. Tu neketiyê.
Ew ketiye. Ew neketiye.
Em ketine. Em neketine.
Hûn ketine. Hûn neketine.
Ew ketine. Ew neketine.

Siz de konu da geçen şu geçişsiz fiillerin 3. geçmiş zamana uygun çekimini yapınız.

Hebûn, derketin (çikmak), hatin, westîn, çûn, helîn, firîn

b) Lêkerên têper (transitiv) = Geçişli fiiller

Erênî nerênî

Min gotiye. Min negotiye. (ben söylememişim)

Te gotiye. Te negotiye.

Wê gotiye. Wê negotiye. (dişil o)

Wî gotiye. Wî negotiye. (eril o)

Me gotiye. Me negotiye.

We gotiye. We negotiye.

Wan gotiye. Wan negotiye.

Siz de konu da geçen şu geçişli fiillerin 3. geçmiş zamana uygun çekimini yapınız

Civandin, bazdan, girtin, xwarin, berdan, têrkirin, xemilandin, dîtin.

Pêhînî 1

Mînak:

her çendî (her ne kadar)

ne kurd, bûn, ji bo, azadî, Kurdistan têkoşîn.

Her çendî ew ne kurd jî bûye, ji bo azadiya Kurdistan têkoşiyaye.

(Her ne kadar kürt de olmasada, Kürdistan'ın özgürlüğü için savaşmış)

1 – ew, ne hatin, diyarî, xwe şandiye.

2 – wê, Kurdistan, dîtin, evîndar, Kurdistan bûn.

3 – wî ne xwendin, xwe, pêşve birin.

4 – ew, evîndar, wê, bûn, bav, wî ew, jê re ne xwestin.

Pêhînî 2

Mînak:

ji ber ku (nedeni ile/ ...diğindan)

birîndar bûn, nekanîn, xwe rizgar, kirin.

Ji ber ku birîndar bûye, nekaniye xwe rizgar bike.

Yaralı olduğundan (dolayı) kendini kurtaramamış.

1 – pir westîn, hima, wir, di xew re, çûn.

2 – nexweş bûn, ne kanin, alîkarî, wî, kirin.

3 – otobûs, ne hatin, ew, rabûn, û, çûn.

4 – Ew, wî, lêgerîn, lê, ew, ne dîtîn.

Bu diyalogu bir arkadaşınla oku.

- Çi dibêjin?
- Dibêjin; hebûye tinebûye!
- Çi hebûye?
- Belengazekî xwedê hebûye.
- Wî biharan çi xwariye?
- Pel û pincar xwariye.
- Lê zivistanan?
- Zivistanan jî derketiye nêçîr û seydê.
- Çi ji ber zinarekî bazdaye?
- Kêvroşkeke belekê rindik bazdaye.
- Lê wî çi kiriye?
- Wî jî serî daye ser
- Kengê pê girtiye?
- Nêzîka tarî têkeve erdê, pê girtiye.
- Baş e, dû re çi bûye?
- Kêvroşk lê hatiye ziman.
- Ji belengazê xwedê re çi gotiye?
- “Min mekuje, ez ne kêvroşk im, ez keça paşayê periyar im.”
- Belengaz çi kiriye?
- Wî ew berdaye.
- Lê bi çi zikê xwe têr kiriye?
- Bi pel û gihayên li ber lat û zinaran zikê xwe têr kiriye.
- Dû re çi kiriye?
- Ji ber ku pir westiyaye, hima li wir di xew re çûye.
- Wî çi xewn dîtîye?
- Di xewna wî de kêvroşk bûye keçeke delal.
- Wî û keçikê çi kirine?
- Bi destê hev girtine û berê xwe dane tirîjê rojê.
- Dû re çi bûye?
- Divê hîn çi be, belengaz miriye.

Yukarıdaki diyalogu Türkçeye çevirin!

BIHARA RENGÎN

Sar û serma zivistanê bi Newrozê re konê xwe ji welatê me barkiribû. Belê, êdî bêhna bihara rengîn li cîhanê hêwirîbû. Gul û beybûnên kesk sor û zer, li gel wan yên mor, gewez, tûtîk û binevşî xweza xemilandibû. Min jî dixwest tevê vê dîlana rengên xwezayê bibim. Lê bizina bavê min ya belek û gayê bavê min yê gewr wenda bûbû. Divyabû ez li wan bigerim. Min ne çolên bê ser û bin, ne jî çiyayên pîroz hîşt. Lê min ew nedît. Sola min ya rastê dirya, yanê qelişî,

lingê min yê çepê ket ber kevir û derizî. Lema ez ji vê xweşiya biharê bêpar mam. Wek kûtek bê mecal di nav xaniyên gund de mam. Belê xaniyên gund, yên ji kevirên gewr ên girnûşin, dûmenek vik û vala para min ketibû.

Wateya peyvên kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlamı)

kon : Çadır, kıldan dokuma göçebe çadırı
êdî : artık
bêhna bihara rengîn : renkli baharın kokusu
Li cîhanê hêwirî bû. : Dünyayı sarmıştı/ işgal etmişti
li gel wan : onların yanında
gevez : kahveye çalan kırmızı
tûtik : turuncu
binevşî : menekşe rengi, açık mor
xweza : dogra
tevê : birlikte, katılım, içine karışma
bizin : keçî
belek : alaca
dîlan : halay, kutlama, şenlik
gewr : gıri
wenda bûn : kaybolmak
wenda kirin : kaybetmek
vîn : ...ebilmek, mecbûr olmak, gerekmek
divyabû /divîbû : gerekiyordu, mecbur
çol : yaban, çorak alan, kırsal
bê ser û bin : ucsuz bucaksız
çolên bê ser û bin : ucsuz bucaksız kırsal alan
pîroz : kutsal
dirîn /qelişîn : yırtılmak, yarılmak
derizîn : çatlamak, lif kopması
lema/lewma/loma : bundan, bundan dolayı
bêpar : paysız
kût : kötürüm, ayaktan sakat
girnuşin : tırtıllı
kevirê girnûşin : tırtıllı taş

Biz bu konuda da dördüncü geçmiş zaman, ya da diligeçmiş zaman hikayesini göreceğiz. Bu zaman “bûn” (olmak) fiilinin geçmiş zaman formu ile yapılır.

Şimdi örneklerle bu formu açıklayalım.

1- Lêkerên têper = Geçişli fiiler

<i>fiil</i>	<i>geçmiş zaman kökü</i>	<i>ahenk takısı</i>	<i>"bû" yardımcı fiili</i>	<i>çekim</i>	<i>anlam</i>
gotin	got	i	bû	Min gotibû	Ben söylemiştim
Xwarin	xwar	i	bû	Min xwaribû	Ben yemiştim
Xwendin	xwend	i	bû	Min xwendibû	Ben okumuşum

a) Eger fiilin geçmiş zaman kökü sessiz bir harfle biterse.

Min gotibû.

Te gotibû.

Wî /wê gotibû.

Me gotibû.

We gotibû.

Wan gotibû.

<i>fiil</i>	<i>geçmiş zaman kökü</i>	<i>"bûn" yardımcı fiili</i>	<i>çekim</i>	<i>anlam</i>
Dan/ dayîn	da	bû	Min dabû	Ben vermiştim
kirîn	kirî	bû	Min kirîbû	Ben satın almıştım

Siz de şu fiilleri dördüncü geçmiş zamanda kullanın. Barkirin, hêwirîn, xemilandin, dîtin, hatin, danîn

b) Eger fiilin geçmiş zaman kökü sesli bir harfle biterse.

<i>fiil</i>	<i>geçmiş zaman kökü /kısa</i>	<i>geçmiş zaman kökü /uzun</i>	<i>"bûn" yardımcı fiili</i>	<i>Kişi zamiri</i>	<i>çekim</i>
kenîn	kenî	keniya	bû	im	Ez kenibûm/ Ez kenyabûm
Man/ mayin	ma	-	bû	im	Ez mabûm
gerîn	gerî	geriya	bû	im	Ez gerîbûm/ Ez geriyabûm
qêrîn	-	qêriya	bû	im	Ez qêriyabûm
bûn	bû	-	bû	im	Ez bûbûm

Siz de şu fiilleri dördüncü geçmiş zamanda kullanın. Birîn, kolan, ramîsan(öpmek), nêrîn

2- Geçişsiz fiiller

<i>fiil</i>	<i>geçmiş zaman kökü</i>	<i>ahenk takısı</i>	<i>"bûn" yardımcı fiili</i>	<i>Kişi zamiri takısı</i>	<i>çekim</i>	<i>anlam</i>
ketin	ket	i	bû	Im	Ez ketibûm	Ben düşmüştüm
	ket	i	bû	Î	Tu ketibûyî	Sen düşmüştün
	ket	i	bûn	-	Ew ketibû	O düşmüştü
	ket	i	bû	In	Em ketibûn	-
	ket	i	bû	In	Hûn ketibûn	
	ket	i	bû	In	Ew ketibûn	

Siz de şu fiilleri dördüncü geçmiş zamanda kullanın.

Hatin, mirin,

b) Eğer fiilin geçmiş zaman kökü sesli bir harfle biterse.

Siz de şu fiilleri dördüncü geçmiş zamanda kullanın.

Çûn, revîn, girîn, nivîn, kelîn, helîn

<i>fiil</i>	<i>geçmiş zaman kökü /kısa</i>	<i>geçmiş zaman kökü /uzun</i>	<i>"bûn" yardımcı fiili</i>	<i>Kişi zamiri</i>	<i>çekim</i>
kenîn	kenî	keniya	bû	im	Ez kenibûm/ Ez kenyabûm
Man/ mayin	ma	-	bû	im	Ez mabûm
gerîn	gerî	geriya	bû	im	Ez gerîbûm/ Ez geriyabûm
qêrîn	-	qêriya	bû	im	Ez qêriyabûm
bûn	bû	-	bû	im	Ez bûbûm

Pêhînî 1

Mînak:

xwestin, çûn, welat, per tine bûn.

Min jî dixwest ez biçim welêt, lê perê min tinebû.

- 1 – (wî) xwestin(d borî 4) xwendin, bavê, feqîr, bûn.
- 2 – Dewlet pere teklîf, kirin, bêşerefî, ne, pejirandin.
- 3 – Wan, zêr, dan, wî, wî, nexwestin(d borî 4).
- 4 – Mal, wî, hebûn, xêr jê ne dîtin.

Pêhînî 2

Mînak:

Dewar nan xwarin, birçî man.
Dewarna nanê me xwaribû, lewma em birçî mabûn.

- 1 – Dewlet rihetî nedan, revîn (d borî 4)
- 2 – Baran wek karest hatin, cîh war xwe terk kirin.
- 3 – Bav nexweş ketin, ew girîn.
- 4 – Ew biçûktiyê jî gund derketin, kesî nas nekirin.

Bu diyalogu bir arkadaşınla oku.

- Sar û serma zivistanê kengê konê xwe ji welatê me barkiribû?
- Sar û serma zivistanê bi Newrozê re konê xwe ji welatê me barkiribû.
- Gul û beybûnên çawa xweza xemilandibû?
- Gul û beybûnên kesk sor û zer, mor, gevez, tûtik û binevşî xweza xemilandibû.
- Divyabû Fêrgîn li çi bigeriya?
- Divyabû ew li bizina belek û gayê gewr bigeriya.
- Ew li ku li wan digeriya?
- Li çiyayên pîroz, çolên bê ser û bin.
- Wî ew dîtî.
- Na wî ew nedîtî
- Çi hat serê Fêrgîn?
- Sola wî ya rastê diriya, lingê wî yê çepê ket ber kevir û derizî.
- Fêrgîn ji çi bêpar ma?
- Ji xweşiya biharê.
- Tenê çi para wî ketibû?
- Xaniyên gund, yên ji kevirên gewrên girnûşin, dûmeneke vik û vala para min ketibû.

Awirên Yarê

Rojeke biharê ye, ez li pastexanê rûniştî, qehwê vedixwim. Di wê kêliyê de evîna ber dilê min ket hundir. Wê berê ez ne dîtî, tenê min ew dît. Min bala xwe da bejn û bala wê. Ew çû, li maseya hemberê min rûnişt. Bi carê ve em hatin çavçavan, wan çirûskên awirên wê ez mest kirim, wek kesekî tevîzî di cîhê xwe de lal bûm, mam. Gava wê bang min kir, ji ber wê mestbûnê min nekanî ku ez bersiva wê bidim. Ew ji wê maseya hember rabû û hat ber min sekinî, berê li rewşa min nêrî û li pey bi carê ve;

“Hêê çi bû?” Got.

Ez bi veciniqîn ji wê mestbûnê rabûm û min got;

“Lê dîlberê, wan awirên te ez mest kirim!”

Wê jî bi devkenî:

“Ooo lawikê evîndar bûye helbestwanekî romantîk!”

Min jî got:

“De henekan cîh bihêle, ma te ez nedîtî, tu çima çûyî maseya din?”

“Na min tu nedît!”

Wateya peyvên kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlamı)

evîn : aşk

evîna ber dilê min : gönlümün aşkı

Wê berê ez nedîtî : O önce beni görmedi.

bejn û bal : boy pos, endam
çavçavan : gözgöze
Em hatin çavçavan : gözgöze geldik.
çirûsk : kıvılcım, ışın,
awir : bakiş
mest kirin : etkilemek, şaşırtmak
tevizî : uyuşmuş, uyuşuk
bang kirin : çağırmak.
bersiv : cevap
rewş : durum
bi carê ve : aniden
veciniqîn : ürmek
evîndar : aşık
helbest : şiir
helbestwan : şair
Te ez neditim. : Sen beni görmedin

Rêziman

Forma serveyî (ergativ) = bükümlü çekim.

a) Gava bireser xwerû be. = nesne (obje) yalın halde bulunduğunda

Konuda geçen şu cümleleri bir daha okuyun.

Wê berê ez nedîtîm, tenê min ew dît. : O önce beni görmedi, sadece ben onu gördüm.

Wan çirûskên awirên wê ez mest kirim. : Onun bakışının kıvılcımları beni mest etti.

“Lê dîlberê, wan awirên te ez mest kirim!” Hey dilber, o bakışların beni mest etti.

Ma te ez nedîtîm?” : Sen beni görmedin mi?

Na min tu nedîtî! : Hayır ben seni görmedim.

Yukarıdaki cümlelerde fiiller öznenin değil, nesnenin (objenin) kişi takılarını almışlardır.

Dilbilgisi ilminde bu forma “ergativ” yani bükülmüş fiil çekimi denir. Sakın bu formu pasif form ile karıştırmayın, her ne kadar çeviride böyle gözüksede, pasif form değildir, biz ileride pasif formu göreceğiz. Anlaşılması için örnek olarak ilk cümleyi alıp tahlil edelim:

Wê berê ez nedîtîm, tenê min ew dît.

Bu cumlede “wê” özne dir. Bu özne bükümlü halde bulunmaktadır.

Cumledeki “ez” nesne dir ve yalın halde dir.

Özne bükümlü, nesne yalın halde olduğundan dolayı fiil nesnenin takısını alıyor, yane “ez dîtim”

Cümle kelimesi kelimesine şöyledir.

Onun (tarafından) önce ben görülmedim.
Cümlelerin esas anlamı: O beni görmedi.

Bu kürtçeye has form, dile şiirsel bir güzellik veriyor. şunu da unutmayın; bu form sadece geçişli fiillerde vardır.

Erênî: Nerênî:

Wî ez dîtim. Wî ez nedîtim.

(O benî gördü.) (O beni görmedi.)

Wî tu girtî Wî tu negirtî.

Wî ew dît Wî ew nedît.

Wî em girtin. Wî em negirtin.

Wî hûn dîtin. Wî hûn nedîtin.

Wî ew girtin. Wî ew negirtin.

Şu örneğe de bakın!

Awirên wê ez kuştım. :Onun bakışları beni öldürdü.

Yada öz biçimi ile : Onun bakışları tarafından ben öldürüldüm.

Awirên wê tu kuştî.

Awirên wê ew kuşt.

Awirên wê em kuştin.

Awirên wê hûn kuştin.

Awirên wê ew kuştin.

Wan çirûskên awirên wê ez mest kirim.

Wan çirûskên awirên wê tu mest kirî.

Wan çirûskên awirên wê ew mest kir.

Wan çirûskên awirên wê em mest kirin

Wan çirûskên awirên wê hûn mest kirin

Wan çirûskên awirên wê ew mest kirin

b) Fiil geçmiş zamanda nesneye göre çoğul takısı alır.

Geçmiş zaman kullanımında nesne çoğul olunca, o nesnenin çoğul oluşu fiilin aldığı çoğul takısıyla anlaşılır. Kürtçede geçişli fiiller geçmiş zamanlarda özellikle nesneli cümlelerde özünde özneye göre çekilmezler, zira bu fiiller geçmiş zamanda infin (çekimsiz)dirler. Sadece nesneye göre şekil alır. Fiiller nesne tekil olunca tekil, çoğul olunca da çoğul takısı alırlar.

Örnek:

Jinê sêv xwar. = Kadın elma yedi.
Jinan sêv xwar. = kadınlar elma yedi(ler)
Jinan sêv xwarin. = kadınlar elmalar yediler.

Cindî beran kirî. = Cindî koç satın aldı.
Cindî beran kirîn. = Cindî koçlar satın aldı.

Xortan hesp anî. = Gençler at getirdi(ler).
Xortan hesp anîn. = Gençler atları getirdiler.

Pêhînî 1 Mînak:

te em ne dîtîn, çima şûn vegeyayî.
Ma te em nedîtîn, tu çima bî şûn ve vegeryayî?

- 1 – te ez ne dîtîn, çima çûn mase din.
- 2 – me ew anîn, tu çima ne hatin.
- 3 – wî hûn ne birin, hûn çima metha wî kirin.
- 4 – Wî xortî em ne xwestin, me jî ew cîh hîştin.

Pêhînî 2 Mînak:

Em rast hev hatin, (wê)çalim û awir wê ez êşandin.
Bî carê ve em rastê hev hatin, wê çalım û awirên wê ez êşandim.

- 1 – em hatin çav çavan, (wan) çirûsk awir wê ez mest kirin.
- 2 – me çarşî hav dîtîn, (wan) gotinên wê ez birîndar kirin.
- 3 – Ew qehwê rast hev hatin, wî ew gotinan êşandin.
- 4 – nav çarşî ketin pêşîr me, em nav civak rezîl kirin.

Bu diyalogu bir arkadaşınla canlı bir şekilde oku.

- Tu li ku rûniştibû?
- Ez li pastexanê rûniştibûm.
- Kengê?
- Rojeke biharê.
- Te li wir çî dikir?
- Min qehwê vedixwar.
- Tu li wir li benda kê bû?
- Ez li benda yara xwe bûm.
- Kengê ew hat?
- Gava min qehwe vedixwar, ew hat.
- Wê tu li rê dîtî?
- Na! Wê berê ez nedîtîm, tenê min ew dît.

- Bêgûman te hima bang wê kir, ne wisa?
- Na! Min berê bala xwe da bejn û bala wê.
- Ohoo tu jî romantîkî ha!
- Na, lo!
- Ê dû re çi bû?
- Ew çû, li maseya hemberê min rûnişt.
- Ohoo! Yar li hember e ! Hey dil. De bêje, paşê çi bû?
- Bi carê ve em hatin çavçavan, wan çirûskên awirên wê ez mest kirim.
- Êhêê! Te jî hima dest avêt qelemê û helbest nivîsî!
- Tu li derdê dilê min û henekê viya binêre!

Şu cümleleri kürtçeye çevirin

Bir bahar günü pastahanede oturmuş kahve içiyorum.
 O sırada gönlümün sevdası içeri girdi.
 O gitti, karsıdaki masada oturdu.
 Birden gözgöze geldik, o bakışlarının kıvılcımları beni mest eyledi.
 Ben uyuşmuş biri gibi yerimde dondum kaldım.
 O beni çağırdığında dona kalışımdan dolayı cevap veremedim.
 O karşıdaki masadan kalktı. Geldi, önümde durdu.
 Önce durumuma baktı, ardından aniden; “Hee ne oldu?” dedi.

RÊWÎ

Ez rêwî me, ez ê sibe biçim welat. Dilhejîkê wisa ez girtime, dikim ku bifirim.
 Eger ev dilhejî wisa biçê, bi rastî jî ez ê bifirim. Ez û Sîdar em bi hev re diçin.
 Em ê bi balafirê bifirin û di nav çend saetan de li welat daynin. Ez ê berê wî
 erdê welat ramîsim. Hûn ê jî wisa bikin? Hima li pey ez ê wê hewa xweş a wekî
 derman bikişînim nava pişikê. Em ê bigerin li wan çîyan û baniyan, dê bêhna
 me vebe, gulên şahiyê di rûyê me de vebide. Bêguman em ê ava kaniyên welêt
 jî, bi têra dilê xwe vexwin û kesera xwe bitefînin.

- Belê, belê hûn ê biçin, hesreta dilên xwe bitefînin. Eh! Xwedê ji me re jî
 kerîm e, em ê jî di xewnên xwe de biçin welat. Wê bayê evîna dil giyana me
 bigire, bibe welat û gav bi gav bigerîne.

- Ez ê îranîstîk bixwînim, Tu yê çi bixwînî?
- Ez ê jî ji îranîstîk beşa kurdî bixwînim.
- Gelo wê ev keçikên li vir çi bixwînin?
- Ew ê jî beşa civaknasî bixwînin.
- Emê zanîngehan biqedînin û xwe ji avakirina welat re amade bikin.
- Wê welatê me bi awayekî nûjen were avakirin.

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlami)

rêwî /rêwîng : yolcu

dilhejî : heyecan, gönül titremesi
Dikim ku bifirim. : uçasım geliyor
balafir : uçak
ramîsan : öpmek (aşıkların öpüşü)
bêguman : şüphesiz
gulên şahiyê : sevinç gülleri
tefandîn /vemirandîn : söndürmek
giyan : ruh, can
di xewnên xwe de : rüyasında
civaknasî : sosyolojî
zaningeh /zanko : üniversite, yüksek okul
avakirin : inşa etmek
nûjen : modern, yeni
bi awayekî nûjen : modern bir şekilde.

Rêziman- dilbilgisi

Dema wê bê (futur1) = gelecek zaman

Kürtçede dilbilimciler tarafından farklı adlandırılan bir gelecek zaman yardımcı fiili var. Bu fiil özünde 'dên' dir. Bu fiil diğer fiiler gibi kişilere göre çekilmiyor. Bir eski biçimi var, bir de yeni biçimi var. Ayrıca ünlem olarak da iki biçimi var. Bunları sırayla açıklayalım.

Önce konumuzda geçenlerden bir kaçına bir göz atalım.

Ez ê sibe biçim welat.
Em ê bi balafirê bifirin
Hûn ê jî wisa bikin?
Tu yê çi bixwînî?
Ew ê jî beşa civaknasî bixwînin.
Wê welatê me bi awayekî nûjen were avakirin. (avabikin)*
Dê bêhna me vebe, gulên şahiyê di rûyê me de vebide.
Wê bayê evîna dil giyana me bigire, bibe welat û gav bi gav bigerîne.
Sîz de tekste bakın gerî kalanların altını çiziniz.

Têbinî (dipnot):

Birleşik fiillerde kip öntakısı olan 'bi' kullanılmaz, ya da kullanımına ihtiyaç yoktur. Bazı yörelerde az da olsa kullanılır.

Konudaki kullanımda da görüldüğü gibi, yardımcı fiil öznedenden sonra sadece 'ê' biçiminde kullanılır. Esas fiilin önünde de kip takısı olan 'bi' öntakısı kullanılıyor.

Mînak:

Çûn

Ez ê biçim. (Ben gideceğim)

Tu yê biçî.

Ew ê biçe.

Em ê biçin.

Hûn ê biçin.

Ew ê biçin.

gotin

Ez ê bêjim (bibêjim).

Tu yê bêjî. (sen söyleyeceksin.)

Ew ê bêje.

Em ê bêjin.

Hûn ê bêjin.

Ew ê bêjin.

Eski biçimi

Çûn gotin

Ez dê biçim. Ez dê bêjim . Tu dê biçî. Tu dê bêjî. Ew dê biçe. Ew dê bêje. Em dê biçin. Em dê bêjin. Hûn dê biçin. Hûn dê bêjin. Ew dê biçin. Ew dê bêjin.

Têbinî:

1- Genelde “Tu” kişî zamirî ile “ê” gelecek zaman fiilî Kürtçe’deki “anlam değişmediğinde sesli harfin biri düşer” kuralına uygun olarak kısaltılmıştır ve “tê” biçimini almıştır.

2- Birleşik fiiller yanında bazı fiillerde anlamı anlaşıldığından istisnai olarak kip öntakısı kullanılmaz. Ama yine de bazı yörelerde kip öntakısı ile kullanılır.

3- Özünde burada çoğul takısı alması gerekir. Ama süreç içerisinde bu çoğul takısına ihtiyaç duyulmamıştır. Bu yüzden kullanımdan kalkmıştır.

Ünlem olarak da iki biçimde kullanılır. Bir “wê” diğeri de “dê” biçimin de.

Wê Kurdistan azad be(bibe)! = Kürdistan özgür olacak.

Wê welatê me bi awayekî nûjen were avakirin. (avabikin)

Dê bêhna me vebe, gulên şahiyê di rûyê me de vebide.

(Nefesimiz açılacak, yüzümüzde sevinç gülleri açacak.)

– Fiiller ard arda kullanıldıklarında gelecek

zaman fiili sadece bir sefer kullanılır.

Mînak:

Ez ê biçim, li welat bigerim, bêhna xwe fireh kim. (fireh bikim) Wê bayê evîna
dîl giyana me bigire, bibe welat û gav bi gav bigerîne.

Pêhînî 1

Mînak:

Amade bûn, hima rê ketin
Ez amade me, ez ê hima bi rê bikevim.
1 – amade bûn, xwe gihandin hevalan

2 – rêwî bûn, sibe çûn welat.

3 – her tişt civandin, komputerê nivisandin.

4 – Def u zurne anîn, govend girtin.

Pêhînî 2

Mînak:

Tu biçî welat tê çî bikî? Erd welat ramisan.

Ezê erdê welat ramîsim.

1 – Gava tu yara xwe bibînî tu yê çî bikî? Ji dîl hejî ji xwe çûn.

2 – Eger tu biçî Amêrîkayê tê çî bikî? Hîn inglîzî bûn.

3 – Eger tu biçî Kurdistanê azad, tu yê çî bikî? Hemû bajaran gerîn.

4 – Tu biçî çîyan tu yê çî bikî. Zinar û latan bazdan.

Şu diyalogu okuyun:

– Ew çî bahol û çante ne?

– Ez rêwî me.

– Tu yê bi ku ve biçî?

– Ez ê sibe biçim welat.

– Tu bi kêf û şahîyî ne wisa?

– Hem jî çawa! Dilhejîkê wisa ez girtime, dikim ku bifirim.

– Tu tenê diçî.

– Na, Ez û Sîdar em bi hev re diçin.

– Hûnê bi çî biçin?

– Em ê bi balafirê bifirin.

– Rê çiqas dikudîne?

– Dê balafir di nav çend saetan de li welat dayne.

– Gava tu li welat ji balafirê paya bûyî, tu yê çî bikî?

– Ez ê berê wî erdê welat ramîsim.

– Lê dû re tu yê çî bikî?

– Hima li pey ez ê wê hewa xweş a wekî

derman bikişînim nava pişikê.

– Tu yê biçî gund yan li bajêr bimînî?

– Ezê biçim gund.

– Li gund tiştek tine tu yê li wir çî bikî?

– Wer nebêje. Em ê bigerin li wan çîyan û baniyan, dê bêhna me vebe.

– Ohohoo Tuyê ava kaniyan jî vexwî?

– Bêgûman em ê ava kaniyên welêt jî, bi têra dilê xwe vexwin û kesera xwe bitefînin.

Şu cümleleri Kürtçe'ye çevirin.

Beni öyle bir heyecan sarmış ki, uçam geliyor.

Bu heyecan böyle giderse, gerçekten uçacağım.

Ben o ilaç gibi temiz havayı ciğerime çekeceğim.

Evet, evet, siz gideceksiniz, gönlünüzün

hasretini gidereceksiniz.

Eh! Allah bize de kerim.

Bizde ruyamızda ülkeye gideceğiz.

Gönül aşkının rüzgarı bizi alacak,

ülkeye götürecek, adım adım dolaştıracak.

Ziman

Dilovan û Bengî rûniştine, li ser zimanan dipeyivin, dîtina herdûyan wiha ye: Her ziman kulilkek ji baxçê xwezayê ye. Divê her mirov bi vî nêrînê li zimanan binêre. Wiha nenêre jî, divê bi kêmasî ji zimanan re rêz bigire. Di nava zimanan de zimanê herî girîng jî zimanê dayîkê ye. Bi gotîneke hê kûrtir, zimanê dapîr û bapîran e. Eger mirov bikane zimanên din jî fêrbibe, tiştekî gelek baş e. Di dawiyê de li ser kurdî peyivîn.

Dilovan : “Em kurd bi her zimanî dinivîsin û dixwînin, lê nikanin bi zimanê xwe bixwînin! Rast ev ji bo me ne şerm e?”

Bengî: “Eger mirov nikanibe bi zimanê dayîkê binivîse û bixwîne, bi rastî jî şerm e.”

Dilovan: “Tu dikanî bi kurdî binivîsî û bixwînî!”

Dildar: “Ez nizamim çawa bêjim! Bi rastî ez dixwezim fêrê nivisandin û xwendina kurdî bibim, lê ta niha hê hîn ne bûme.”

Bengî: Ez dikanim bi kurdî bixwînîm û binivisînîm. Ez dixwezîm hînê soranî û kirdkî jî bibîm!”

Dilovan: “Xwezîl bi dilê te! Divê ez jî di demeke kin de fêrê nivîsandin û xwendina kurdî bim!”

Dildar serê xwe kir ber xwe. Şeydayê lê nêrî û:

“Çi bû? Te te fedî kir?”

Bengî: “Nizanim! Tişteke wilo! Ez dikim rabim, biçim mal.

şerm : utanç, ayıp

dîtin : görüş

wiha : şöyle

Dîtina herduyan wiha ye. :İkisinin görüşü şöyledir.

kulîlk : çiçek

nêrîn : bakış

bi vê nêrînê : bu bakışla

kêmasî : eksiklik, en az

bi kêmasî : en azında

rêz girtin : saygı göstermek, hürmet etmek, tolerans göstermek.

rêzdar : sayın

girîng : Önemli mühim

herî girîng : en önemli

herî : azami

kurt/ kin : kısa

kurtir : en kısa

dapîr û bapîran : nineler ve dedeler, atalar

fêrbûn / hîn bûn : öğrenmek

soranî : Güney’de konuşulan Kürtçe lehçesi

kirdkî : Kuzeybatı’da konuşulan Kürtçe’nin lehçesi (Zazaki)

Rêziman

Lêkerên alîkar = Yardımcı fiiller.

Bu konuda da yardımcı fiilleri öğreneceğiz. Daha önce gelecek zamanda kullanılan bir yardımcı fiil görmüştük. Türkçe’de yardımcı fiiller temel fiilin sonuna getirilen eklerle yapılmakta. Türkçe’nin aksine Kürtçe’de bir çok yardımcı fiil kullanılır. Biz burada bir kaçını öğrenelim.

1 –“Kanîn” yada “karîn” =... ebelmek, ...abilmek ikisi de kullanılmaktadır. İkisi de aynı anlamdadır. Hangisini kullanırsan kullan Kurmanci konuşan bütün

Kürtler tarafından bilinir.

a) tek başına çekimi
Erênî

Ez dikanim /dikarim = Ben ...ebilirim Tu dikanî /dikarî Ew dikane /dikare
Em dikanin /dikarin Hûn dikarin /dikarin Ew dikanin /dikarin

Dema Borî I

Min kanî /karî min nikanî /nikarî
Min nekanî wî bibînîm. = Onu göremedim

Dema borî II

Min dikanî /dikarî min nedikanî / nedikarî
Min dikanî ew bidîta. = Onu görebilirdim.

Dema borî III

Min kaniye /kariye min nikaniye /nikariye
Mi nekaniye ji wî re alîkarî bikim. =Ona yardım edememişim.

Dema borî IV

Min kanîbû /karîbû /min nikanîbû /nikarîbû
Min nekanîbû ew bidîta. = Onu görememiştim.

b) Temel fiiller ile “kanîn /karînin“ kullanımı

Temel fiiller yardımcı fiil ile birlikte kullanıldığında, kip formunda olurlar, yanı fiil kiplerin öntakısı olan “bi“ edatını alırlar. Ayrıca hem yardımcı fiil hem de temel fiil zamirin çekim takısını alır.

Mînak:

Ez dikanim wî bibînîm

Bu cümlede “di“ edatı şimdiki zaman takısı, “bi“ edati da kip öntakısıdır. Yardımcı fiil “kanîn“ ve temel fiil “dîtin“ fiillerinin sonundaki “im“ takısı da birinci tekil şahısın çekim takısıdır.

Şu örnekleri inceleyiniz

Ez dikanim bi kurdî bixwînîm = Ben Kürtçe okuyabiliyorum.
Ez dikanim biçim.
Ez dikanim bipeyivim, = Ben konuşabiliyorum

Tu dikanî bipeyivî.
Ew dikane bipeyive,
Em dikanin bipeyivin ûwd.
Sen de şu fiileri yardımcı fiil “kanîn” fiili ile çek.
Revîn, xwarin, dîtin, gotin, şûştin.
B-Lêkera alîkar “xwestin”=Yardımcı fiil istemek.
Bu da aynen “kanîn” kurallarına göre çekilir

Mînak:

Ez dixwazim biçim malê.
Ez dixwazim ji te re tiştêkî bibêjim.
Sen de yardımcı fiil “xwestin” aşağıdaki fiillerle birlikte kullan.
Ji te re gotin, çûn mal, raketin, rawestan, hevalê xwe gerandin, li Almanyayê xwendin, bi kurdî nivisandin.

Yardımcı fiil “Vîn/viyan”

Bu yardımcı fiili daha önceden de tanıyoruz. Bunun sadece bir şimdiki, bir de geçmiş zaman formu vardır ve öznenen önce gelir.

Dema niha
Divê ez biçim malê.
Dema borî
Divîbû ez biçûma malê.

Halk arasında aşağıdaki formlar da kullanılır.

Ger(e) /gerekê ez biçim malê = Eve gitmem gerekir.
Diviya ez biçûma mal. =Eve gitmem gerekiyordu.
Yine “bûn” fiilini daha önce görmüştük. mişli geçmiş zaman kurmasında yardımcı fiil olarak kullanılır. Ayrıca aşağıdaki gibi de kullanılır.
Dibe wekî te jî be. = Senin gibi de olabilir.
Dibe ji bîr kiribe.=Unutmuş olabilir.

Yine “kirin” fiili de bazı durumlarda yardımcı fiil olarak kullanılır. Aşağıdaki örnekleri dikkatlice oku ve kavramaya çalış.

Mînak:

Dikim biçim malê. = Eve gitmek niyetindeyim (ikircikli)
Dikim werim.= Gelmek niyetindeyim.
Dikim werim, nizanim werim, yan na! Gelmek niyetindeyim, geleyim mi gelmeyeyim mi?

Pêhînî 1 Mînak:

Zarok şênahî malan bûn, (divê) her kes çav lê nêrîn
Zarok şênahiya malan e, divê her kes bi vî çavî lê binêre.

- 1 – Ziman wek kulîlk baxçe bûn, (divê) mirov wisa dîtîn.
- 2 – Welat wek dayîk bûn, (divê) her kes wisa dîtîn.
- 3 – Dê û bav sertac mirovan bûn, (divê) kes wan ji bîr ne kirin.
- 4 – Zimanê kurdî talûkê bûn, ji wê (divê) her kes kurdî peyivin.

Pêhînî 2 Mînak:

Em kanîn tirkî stran, kanîn bi kurdî stiran
Em dikanin bi tirkî bistirên, lê nikanin bi kurdî bistirên.
Biz Türkçe şarkı söyleyebiliyoruz, ama Kürtçe söyleyemiyoruz.

- 1 – Em kurd her ziman xwendin, nikanin bi kurdî xwendin.
- 2 – Em kurd kanin bi tirkî nivisin, nikanin bi kurdî nivisandin.
- 3 – Em kanin almanî peyivin, nikanin bi kurdî peyivin.

KALÊ REBEN

Kalê reben serê xwe rakir, bi şêweyekî melûl û ji hevdaketî li jina xwe ya ji xwe ciwantir bi stûxwarî nêrî, bi dengê zar zor tê fêmkirin:

“Ez gelek nexweş im, nikanim (karim) rabim. Tu dikanî xêra dê û bavê xwe tasekî avê bide min?” got.

Jinika bi vî dengê melûl ji cîhana xeyal û xewjînan zivirî, bê dudiliyek bi dengê xweş wiha bersiva wî da:

“Çima nikanibim! Ez dikanim avê jî, nan jî bidim te, bes tu bixwazî.”

Kalê bê hêvî li hember vê bersiva xweş û bi bawer:

“Xwedê ji te razî be!” got û berê hinek rawestiya, dûv (dû) re: “Divê ez herim alif jî bidim dewaran, lê bi vî rewşî nikanim biçim... Hê!..

Zarokino, ma hun dikanin biçin?” got.

Zarokan bi yek dengê bersiv danê:

“Belê, kalo, em dikanin.”

Jinikê berê xwe da kalê reben û jê re:

“Ez dixwazim biçim mala keça xwe, tu çi dibêjî?”

“Hima kengê dixwazî biçî, lê divê tu êvarê vegerî. Hîn gelek karê me heye. Divê em hîn darên şewatê bidin hûrkin, xanê bidin loxkin, kulekan bidin girtin!”

Jinikê bi hêrs gotina wî birî û:

“Oooof!... Nan bidin lêxistin, fera û folan bidin şuştin! Hîn dan tê kutan, mange tên dotin, stran tên gotin! Ma gotinek din ma?”

Hinek rehê mêraniyê hat kalê û :

“Ma te ji bo çi mêr kiriye! Bo rûniştinê? Ev mal e! Divê her karê malê bê kirin.”

- Ev çi rewş e! Em heroj tên kuştin.
- Belê, belê, em hatin kuştin, em tên kuştin, eger wisa biçe, emê hîn pir bên kuştin.
- Heso porê xwe dide kurkirin (kurtkirin, qusandin).
- Ma wî hîn hefta çûyîn porê xwe kurkiribû!
- Lo, lo ew kilê çavên keçan e, ewê sibê jî bide çêkirin.
- Ez dixwazim sibe biçim mal.
- Fermo, tu dikanî biçî.
- Hêrs nebe, divê ez biçim. Divêtî heye.
- Ha ew mijara! Belê, divê tu biçî.

Wateya peyvên Kurdî (Kürtçe sözcüklerin anlamı)

reben : zavallı

şêwe : tarz, biçim.

melûl : sönük, zayıf, halim

hevdaketî : dökülmüş, dökük,

ciwan : genç

stûxwarî : boynu bükük

kanîn /karîn : ...e bilmek, o yetenekte olmak (yardımcı fiil)

Ez dikanim bêjim. : Ben söyleyebilirim.

xwezil : keşke

dudilî : ikircikli, şüpheli

bes : yeter

bawer : güven, inanç

rawestan : durmak, dikilmek
alif : yem, hayvan yemi
vîn : gerekmek, mecbur olmak, irade
şewat : yangın
darên şewatê : yakacak odun
kulek /rojing : dam üstünde ki pencere.
Nan bidin lêxistin.: Ekmek yaptırmak(Pişirtmek)
dan : döğme (buğday)
reh : kök, damar
mêranî : erkeklik, yiğitlik
Em heroj tèn kuştin.: Biz hergün öldürölüyoruz.
kurkirin / qusandin : saç tıraşı olmak

Biz bundan önceki derste bazı önemli yardımcı fiileri ve kullarımlarını görmüştük. Bu konuda da iki önemli fiili yardımcı fiil olarak da göreceğiz. Yani “dayîn” ve “hatin” fiileri yardımcı fiil olarak nasıl kullanıldıklarını göreceğiz. Ayrıca bu fiiler yardımıyla edilgen (pasif) formu ile yaptırın formunu da göreceğiz.

a) Dankir (kausativ) = Ettirgen

Kürtçede bu form “dan” fiilinin yardımı ile yapılır. Bu form başkasına yaptırılan eylemleri içerir. Biz konuyu da bazı örneklerle açıklayalım.

Mînak:

Ez porê xwe didim kurkirin (qusandin). = Saçımı kestiriyorum.
Ew xaniyekê dide lêkirin. = O bir ev yaptırıyor.

Yukarıda verilen iki örnekte görüldüğü gibi yardımcı fiil olarak kullanılan “dayîn” fiili çekime uğramış, ama temel fiil mastar şekli ile kalmıştır. Bu biçim çekim bu formun temel özelliğidir. Sadece yardımcı fiil kişilere ve zamana göre çekilir.

Bugünkü konuda geçen şu örneklere bir göz atalım.

Divê em hin darên şewatê bidin hûrkirin,

Xanê bidin loxkirin,.

Kulekan bidin girtin!

Nan bidin lêxistin.

Fera û folan bidin şûştin!

Heso porê xwe dide qusandin.

Bir örnek çekim yapalım.

erênî

Ez kurê xwe didim xwendin. = Ben oğlumu okutturuyorum.

Tu keça xwe didî xwendin. = Sen kızını okutturuyorsun.

Ew kur û keça xwe dide xwendin. = O oğlunu ve kızını okutturuyor.

Em zarokên xwe didin xwendin. = Biz çocuklarımızı okutturuyoruz.

Hûn kurên xwe didin xwendin. = Siz oğullarınızı okutturuyorsunuz.

Ew keçên xwe didin xwendin. = onlar kızlarını okutturuyorlar.

nerênî

Ez kurê xwe nadim xwendin. = Ben oğlumu okutturmuyorum.

Tu keça xwe nadî xwendin. = Sen kızını okutturmuyorsun.

Ew kur û keça xwe nade xwendin. = O oğlunu ve kızını okutturmuyor.

Em zarokên xwe nadin xwendin. = Biz çocuklarımızı okutturmuyoruz.

Hûn kurên xwe nadin xwendin. = Siz oğullarınızı okutturmuyorsunuz.

Ew keçên xwe nadin xwendin. = onlar kızlarını okutturmuyorlar.

b) Forma pasiv = pasiv formu yada edilgen çatı

Türkçede bu form takı yardımıyla yapılır. Örneğin: “Çocuklar sevilir.” Bütün Hint- Avrupa dillerinde bu form yardımcı bir fiil ile yapılır. Bu gruba dahil olan Kürtçede bu form için “hatin” fiili yardımcı fiil olarak kullanılır.

Mînak:

Zarok tên hezkirin.

Bu formda da sadece yardımcı fiil olan “hatin” çekime uğrar. Temel fiil mastarlı bir şekilde kalır. Yani hiç değişmez.

Konuda geen rnekleri alalım.

Hîn dan t  kutan. = Daha d ğme d ğ lecek

Mange t n dotin. = İnekler saėılacak.

Stran t n gotin! = T rk ler s ylenilecek.

Em heroj t n kuřtin.= Biz her g n  ld r l yoruz.

Bel , bel , em hatin kuřtin. = Evet, evet, biz  ld r ld k.

Em t n kuřtin. = Biz  ld r l yoruz.

Em   h n pir b n kuřtin.= Daha ok  ld r leceėiz.

 rnek ekim.

er n 

Ez t m hezkirin = Ben seviliyorum.

Tu t y  hezkirin.

Ew t  hezkirin.

Em t n hezkirin.

H n t n hezkirin.

Ew t n hezkirin.

ner n 

Ez nay m hezkirin = Ben sevilmiyorum.

Tu nay  hezkirin.

Ew nay  hezkirin.

Em nay n hezkirin.

H n nay n hezkirin.

Ew nay n hezkirin.

Pêhînî 1 Mînak:

Trimbêl nebûn, (tu) kanin min xwe birin.

Tirimbêla min tine, tu dikanî min bi xwe re bibî?

Benim taksim yok, beni beraber götürebilir misin?

1 – Heval ne bûn, (tu) kanin min hevaltî kirin.

2 – Zeman ne bûn, (tu) kanin name avêtin postê.

3 – Gelek nexweş bûn, (tu) kanîn xêra dê û bavê xwe tasek av dayîn?

4 – (Ew) îro nekanin hatin, (tu) kanin cîhê wî xebitîn (çalışmak)?

Pêhînî 2 Mînak:

Zivistan hatin sar bûn, der pencere nû dayîn çêkirin.

Zivistan tê, sar e. ez derî û pencerên nû didim çêkirin.

Kış geliyor, soguktur, yeni kapı ve pencereleri yaptırtıyorum. 1 – Por te dirêj bûn, çûn berber, dan çêkirin.

2 – Sol te kevin bûn, sol nû dayîn çêkirin.

3 – Kinc hazir ne kirin, kinc nû dan çêkirin.

4 – Xanî kevn ne kirin, xanî nû dayîn lêkirin.

Pêhînî 3 Mînak:

Dem hatin, giha hatin çinîn.

Dem hatiye, giha tê çinîn.

Zamani gelmiş, ot biçiliyor.

1 – Dem zarok hin biçûk bûn, hatin hezkirin.

2 – Ezman sayî bûn, stêrik hatin dîtîn.

3 – Gava, roman baş bûn, hatin xwendin.

Eger,

- Eger ez cardin biçim welat, ezê pincarên biharê bidim hişk kirin û bînim. Kê wan pincaran bixwe, tucar nexweş nakeve. Lê gava tu biçî, tuyê çi bikî? Çi bînî?

- Heke rojekê nesîbê min be û ez bikanim biçim!... Ezê axa welat bînim, ax!... Wekî giyanpak Nûrî Dêrsimî bi balgiya xwe ve bidûrim û bidim bin serê xwe.

- Wele min kiriye serê xwe, heke xwediyê kar bo şeş hefteyan îzin bide min, ezê biçim.

- Law bes e!... Bes eee!... Eger hebe, eger bide, eger bibe!... Eger, eger!... heke, eke! Bese lo!...

- Ma em çi bikin! Bê daxwazî û hêvî nabe, divê mirov bi hêvî be, Mirov nikane bê hêvî bijî.

- Wê çaxê de were, em dest pê bikin: Xwezila ez niha li ser kaniya zozanê me bama, min agirê darê mazî dabida, kivkarikê kinkorê berev bikira, li ser wî agirî kewa bikira û têra dilê xwe bixwara.

- Bila welatê min rizgar be, qe jî ez bimirim.

- Lo lo, bila ew neyê, qe jî kar bi tevhevî li ser min bimîne.

- Gerekê li pey şîv xwarinê bi rê biketana.

- Divyabû ew bi şev têketana meterîsê, hetanî sibê têde bimana.

balgî/ balif : yastık

ax / xwelî : toprak

giyanpak : şehit / rahmetli / ruhu nurlu

xwedî : sahip

xwediyê kar : iş sahibi

Lawo bes e! : Yeter yaho!(ulan)

eger/ heke/ eke/ ger : eğer şayet

hêvî : umut /ümit

daxwazî : istem / talep

xwezil : ne mutlu, keşke

xwezila : keşke

mazî : meşe ağacı, araba mili

agirê darê mazî : mêşe ağacı ateşî

kivkarik /kakulilk : mantar

kinkor : geniş yapraklı bir çeşit ot.

kivkarikê kinkorê : kinkor mantarı.

berevkirin : toplamak

kewa : közleme

kewakirin : közlemek

kewaw /kebab : közlenen

kift : sıkı, sıkılmış

kifte : köfte (sıkılmış sözcüğünden geliyor)

rizgar bûn : kurtulmak

rizgarî : kurtuluş

bila : hiç değilse, ah bir olsa, hiç de
qe /qet : hiç
qe jî / qet jî : hiç de
tevhev : tüm, tamam
tevhevî : tamamı
şîv : akşam yemeği
meteris : siper.
sî : gölge
per : kanat, telek

Anlaşılması için lütfen konunun kısa cümleler halindeki tercümelerini dikkatli inceleyin.

Eger ez cardin biçim welat, : Eğer bir daha ülkeye gidersem!
Ezê pincar bidim hişk kirin û bînim. : Pancar kuruturacağım ve getireceğim
Kê wan pincaran bixwe, nexweş nakeve. : Kim o pancarları yerse, hasta olmaz
Lê gava tu biçî, tuyê çi bikî? Çi bînî? : Şayet sen gidersen, ne yaparsın, ne getirirsin?
Heke rojekê nesîbê min be? : Şayet bir gün nasip olursa?
Ez bikanim biçim!... : Ben gidebilsem!..
Ezê axa welat bînim, ax!... : Ülkenin toprağını getireceğim! Toprak!
Wekî giyanpak Nûrî Dêrsimî bi balgiya xwe ve bidûrim û bidim bin serê xwe.
= Rahmetli Nûrî Dersimi gibi yastığıma dikip başımın altına koyacağım.
Heke xwediyê kar bo şeş hefteyan îzin bide min! = Eğer iş sahibi bana altı hafta için izin verirse!
Law bes e!... Bes eee!... : Yeter yahu, yeter!
Eger hebe, eger bide, eger bibe!... : Şayet olursa! Eğer verirse! Eğer olursa!
Ma em çi bikin! Bê daxwazî û hêvî nabe! : Ne yapalım, istem ve umut olmadan, olmaz.
Divê mirov bi hêvî be! : İnsan umutlu olmalı
Mirov nikane bê hêvî bijî. : İnsan umutsuz yaşayamaz!
Wê çaxê de were, em dest pê bikin! : O zaman gel başlayalım.
Xwezila ez niha li ser kaniya zozanê me bama! : = Keşke şimdi yaylamızın çeşmesinin başında olaydım.
Min agirê darê mazî dabida! : Mêşe ağaçlarından ateş yaksaydım.
Min kivkarikê kinkorê berevbikira! : Kinkor mantarlarını toplasaydım.
Min ew li ser wî agirî kewabikira! : Onları ateşin üstünde közleseydim.
Min têra dilê xwe bixwara! : Doyuncaya kadar yeseydim!
têra dilê xwe : gönlüme uygun, gönlümce
Bila welatê min rizgar be, qe jî ez bimirim. : Ülkem kurtulsun da, ben öleyim.
Bila ew neyê, qe jî kar li ser min bimîne. : O gelmesin, hiç de iş üstümde kalsın!
Gereke li pey şîv xwarinê bi rê biketana. : Akşam yemeğinden sonra yola çıkmaları gerekirdi.
Diviyabû ew bi şev têketana meterîsê! : Akşam sipere girmeleri gerekirdi!

Rawe : kîp

Daha önce de söylemiştik, Türkçe de birçok form son ekler yardımıyla yapılır. Kiplerin yapımı Kürtçe de farklıdır. Yardımcı sözcükler ve ön takı yardımıyla yapılır.

Örnek : istek kipi

Ez rabim, biçim malê. : Ben kalkıp eve gideyim.

Ez biçim malê? : Eve gideyim mi?

Ez bixwînîm : okuyayım

Erênî: Ez bixwînîm Ben okuyayım

Tu bixwînî Sen okuyasın

Ew bixwîne O okuya

Em bixwînî. Biz okuyalım

Hûn bixwînî. Siz okuyasınız.

Ew bixwînî. Onlar okuyalar.

Nerênî: Ez nexwînîm. Ben okumayayım.

Tu nexwînî. Sen okumayasın.

Ew nexwîne. O okumaya.

Em nexwînî. Biz okumayalım.

Hûn nexwînî. Siz okumayasınız.

Ew nexwînî. Onlar okumayalar.

Geçmiş zaman (sanal):

Örnek:

Ez biçûma, baş dibû. = Gitseydim, iyi olurdu.

Min bixwenda, çi derdê min hebû = Okusaydım, ne derdim olurdu.

Roja rizgariyê bihata! = kurtuluş günü gelseydi.

Têper = geçişli erênî:

Min bixwenda Okusaydım.

Te bixwenda Okusaydın

Wî bixwenda O (eril) okusaydı

Wê bixwenda O (dişil) okusaydı

Me bixwenda Okusaydık

Wan bixwenda Okusaydılar

nerênî:

Min nexwenda: Ben okumasaydım

Te nexwenda:

Têneper = geçişsiz

erênî:

Ez bihatama Ben gelseydim.

Tu bihatayî

Ew bihata

Em bihatana

Hûn bihatana

Ew bihatana

nerênî:

Ez nehatama: Ben gelmeseydim.

Yukardaki çekimlerin önüne “heke, eger, eke, ku” sözcükleri getirildiği zaman bu istek kipleri şart kipi özelliğini alır. Not: “heke, egere, eke, ger” sözcükleri aynı anlamdadırlar. Bunlardan herhangi biri kullanıldığında, anlaşılır.

Heke ez biçim! = gidersem

Ku ez bijîm = yaşarsam

Eger ez bêm! = gelirsem

Halk dilinde

Eger ez werim = gelirsem (eğer gelirsem)

Heke ez bijîm = yaşarsam

Heke ez bêjim = söylersem.

erênî:

Eger ez bijîm Eger ez bêjim (bibêjim).

Eger tu bijî Eger tu bêjî.

Eger ew bijî (bije) Eger ew bêje.

Eger em bijîn. Eger em bêjin.

Eger hûn bijîn. Eger hûn bêjin.

Eger ew bijîn. Eger ew bêjin.

nerênî

Eger ez nejîm. = yaşamazsam

ku ez nejîm.

Eger ez nebêjim. = söylemezsem

Ku ez nebêjim

Ayrıca yukarıdaki geniş zaman formu yanında, aşağıdaki gibi şimdiki zaman formu da kullanılmaktadır. Siz de bu şimdiki zamanı çekiniz.

erênî:

Eger ez dijîm. = Yaşıyorsam.
Eger ez dibêjim. = Söylüyorsam.
Ku ez dijîm. = Yaşıyorsam.

Nerênî:

Eger ez najîm. = Yaşamıyorsam.
Ku ez najîm.
Eger ez nabêjim. = Söylemiyorsam.
Ku ez nabêjim.

Dema boriya têdayî = Dili geçmiş zaman

Anlaşılması için önce cümle içinde birkaç örnek verelim.

Têneper = geçişsiz

Eger ez hatim, ezê du gotina bêjim. = Geldiysem, iki söz söylerim.
Ku tu ketî, tu kes alîkari nake. = Düştüysen, kimse yardım etmez.
Heke ew çû, ewê tişteke bibêje. = O gittiyse, bir şeyler söyler.

erênî: nerênî:

Eger ez hatim. Eger ez nehatim. (gelmediysem)
Eger tu hatî. Eger tu nehatî.
Eger ew hat. Eger ew nehat.
Eger em hatin. Eger em nehatin.
Eger hûn hatin. Eger hûn nehatin.
Eger ew hatin. Eger ew nehatin.

Sal û Saet

Temenê mirovan ne pir dirêj e. Mirov zaroktiya xwe piçek dijî, li pey hew dibîne ku di nav çend salan de mezin bûye. Sal jî ne dirêj e, ne wisa? Tenê çar demsalên wê hene. Mirov dikane bibêje dazdeh meh, yan jî pêncî û du hefte ye. Bi zimanekî din sêsed û şeş û pênc roj û nîv e. Hejmar çiqas zêde dibe dem jî ewqas kurt dibe. Salekî bi tevhevî li dora 8772 saetan e.

Zinar -Tu çima dîsa serê me bi tiştên vala dêşînî?

Sercan - Na lo! Ez serê te naêşînim, tenê rastiye dibêjim.

Z - Ma rastî bi te maye?

S - Ca wan pirsên dîno mîno cîh bihêle, tu dikanî navê herçar demsalan bêjî.
 Z - Belê, bihar, havîn, payîz, zivistan.
 S - Belê, belê, li biharê kulîlk vedibin, havînê hewa germ e, payîz bendera meweşyan e, zivistan jî kirasê ji berfê li xwe dike.
 Z - Oho hoo! Li Sercanê romantîk binêrin!
 S - Henekan cîh bihêle, tu dikanî navê mehan bêjî?
 Z - Di wî de çi heye! Aha ji te re: “Rêbendan, reşemî, adar, avrêl, gulan, pûşper, tîrmeh, tebax, rezber, cotmeh, mijdar, berfenbar.
 S - Ma navê cotmehê ne kewçêr e?
 Z - Welle ez nizanîm! Min kew neçêrandiye! Eger tu wilo bibêjî, ezê jî ji te re şivanê kewan, ango kewçêrvan bibêjim.
 S - De qeşmeriyê cîh bihêle, hinek wilo dibêjin, ji mijdarê re jî “sermawez” dibêjin!
 Z - Hevalê delal tu jî me nekî rewşa zimanzanan, em wiha xweş dibînin.
 S - Tu rojên hefteyê jî dizanî
 Z - Ha ha! Ma ez wekî te nezanîm?
 Rojên hefteyê heft in, carna bi êş, keft û left in.
 Duşemî destpêka karê heftê ye, vê rojê kar giran e, çav li êvarê ye.
 Sêşemî roja bêdeng e û hima li pey duşemî ye.
 Çarşemî li navenda heftê şaş û lal maye.
 Pêncşem dawiya rojên bi hejmar e.
 Inî bi serê xwe ye, nizanîm çima nebûye şeşşemî.
 şemî destpêk e, yekşemî roja betlanê ye.
 S - Bi rastî tu jî î ha! Tewlo dolo!
 Z - Ma tu henekê xwe bi min dikî? Tu mêr î tu jî danên rojê bibêjî.
 S - Berê berbang, li pey beyanî, bi parîkî nanî, navê wê dibe xwirînî,
 Li pey taştê tê nava rojê tê, navê xwarina wê firavîn e, ev tev li danê sibê ne.
 Danê êvarê destpê dike bi esra biyanî, li pey wê êvar e dayîkê şîv danî.
 Tarî dikeve erdê, dibe şev, navê xwarina şevê paşîv
 Ev jî danê şevê ye, de têke tûr, heqîb.
 Z - Ha ha ha! Zikbirçî, çavên te tenê li xwarinê ye.
 S - Ez westiyam, êdî bes e!
 Z - De bes e, bes e!

sal : yıl

saet : saat

temen : ömür, yaş

zarokatî /zaroktî : çocukluk

di nav çend salan de : bir kaç yıl içinde

demsal / werz : mevsim

dazdeh / diwazdeh : 12

meh : ay (on iki ay)

pêncî û du : 52

sêsed û şeşt û pênc û nîv : 365,5

nîv : yarım

hejmar : sayı
kurt / kin : kısa
heŝthezar û hevsed û heftê û du: 8772
pîrs : soru
dîno mîno : delî melî
cîh hîştin : bırakmak, geride bırakmak
li cih hîştin : yerinde bırakmak, terk etmek
bihar : ilkbahar, (cemreli, yaşam sıcaklığı)
havîn : yaz mevsimi
payîz : sonbahar
zivistan : kış
kulîlk : çiçek
vebûn : açılmak
bênder / bêder : harman
kiras : iç çamaşır, fistan
berf : kar (kışın kar yağar)
li xwe kirin : giyinmek
rêbendan / çile : ocak ayı
reşemî / sibat : şubat
adar : mart
avrêl / nisan : nisan
gulan : mayıs ayı
pûşper / heziran : haziran
tîrmeh : temmuz
tebax / gelavêj : ağustos
rezber / ilon : eylül
cotmeh / kewçêr : ekim ayı
mijdar / sermawez : kasım
berfembar / kanûn : aralık
kew : keklik
çêrandin : otlatmak
ziman : dil, lisan
zimanzan : dilbilimci
keft û left : zorlu zahmetli, müsademe
duşemî : pazartesi
sêşemî : salı
çarşemî : çarşamba
pêncşemî : perşembe
în : cuma
şemî : cumartesi
yekşemî / bazar : pazar
şeş : 6
şaş : yanlış, şaşırış
jîr : akıllı, çalışkan
betlane : tatil

destpêk : başlangıç
dan : vardiye, günün üçtebiri
danê sibê : öğleden önce
danê êvarê : öğleden sonra
danê şevê : gece vardiyesi
berbang : şafak
beyanî : sabahın ilk saatleri
parî : biraz, bir ısırım, azıcık
xurni : sabahın ilk saatinde, yenen sigara altı.
taştê : sabah yemeği
nava rojê : gün ortası
fravîn / navroj : öğle yemeği
esir / berêvar : ikindi vakti
biyani : yabancı, el
şîv : akşam yemeği
berşiv : ikindi yemeği
paşiv : imsak
heqîb : heybe
birçî : aç
zikbirçî : aç, aç karınlı
rojbûn : doğumdünü
çend salî : kaç yaşında
Şu soruların cevabını ver
Mînak:

Tu çend salî yî? Ez 55 (pêncî û pênc) salî me.

Tu çend salî yî? _____

Tu di kîjan demsalê de hatî dinê? _____

Tu di kîjan mehê de hatî dinê? _____

Navê fala te ya stêrkan çi ye? _____

Navê mehên biharê çi ne? _____

Newroz di kîjan mehê de ye? _____

Serêsalê bi kîjan mehê dest pê dike? _____

Navê meha dawîya salê çi ye? _____

Navê mehên havînê çi ne? _____

Navê mehên payîzê çi ne? _____

Roja herî dirêj di kîjan mehê de ye? _____

Di kîjan mehan de şev û roj dibin yek? _____

Navê kewçêr ê yê din çi ye? _____

Navê heziranê çi ye? _____

Navê sibatê çi ye? _____

Demsala herî germ kîjan e? _____

Demsala herî sar kîjan e? _____

Demsala mêwe û pelweşînê kîjan e? _____

Kulîlk di kîjan demsalê de vedibin? _____

Hefteke çend roj in? _____

Çend danê rojê hene? _____

Ûnce şu cûmleleri okuyun, sonra da aşağıdaki soruları cevaplayın.

Roja duşemiyê dibistan vedibe. Sêşemî roja li dû duşemiyê ye. Roja çarşemiyê navenda hefteyê ye. Çawa li pey 4 hima 5 tê, pêncşemî jî li pey çarşemiyê tê.

Roja îniyê ders diqede. Şemî roja betlanê ye. Yekşemî jî betlane ye û roja li pêş duşemiyê ye.

Pirs:

1 - Kîjan rojê dibistan dest pê dike? Roja _____

2 - Navê roja li pey duşemiyê çi ye? _____

3 - Kîjan roj navenda hefteyê ye? _____

4 - Li pey çarşemiyê kîjan roj tê? _____

5 - Kîjan rojê dibistan tê girtin? _____

6 - Li pey îniyê kîjan roj tê? _____

7 - Navê roja berê duşemiyê çi ye? _____

Boş yerleri şu sözcüklerle doldurun. “ Berbang, beyanî, nava rojê, esir, êvar, şev, danê sibê, danê êvarê, danê şevê”

1 - Gava herder tarî dibe, em dibêjin êdî _____ e.

2 - Gava destê sibê sorahiya rojê xuya dike, dibe _____ sibê.

3 - Ji navenda rojê re _____ tê gotin.

4 - Li pey berbangê _____ tê.

5 - Ji ber êvarê re _____ jî tê gotin.

6 - Gava roj diçe ava dibe _____.

7 - Ji dema di navbera êvar û beyanî re _____ têgotin.

8 - Navê dema di navbera berbang û navarojê _____ ye.

9 - Ji nava rojê hetane roj diçe ava jî danê _____ ye.

Aşağıdaki boş yerleri şu sözcükler le doldurun. “betirpêrar, pêrar, par, isal, saldîn, sala dîn!

Mînak

Tu du sal berê li ku bûyî?

Ez _____ li Kurdistanê bûm.

Ez pêrar li Kurdistanê bûm.

1- Tu sê sal berê çûbûyî ku?

Ez _____ çûbûm welat.

2 - Tu sala berê hatibûyî Newrozê?

Belê ez _____ hatibûm Newrozê.

3 - Tu sala pêşiya me dibî çendsalî?

Ez _____ dibim 30 (sîh) salî.

4 - Tu yê vê havînê biçî welat?

Belê ezê _____ biçim welêt.

5 - Tu par ne sala berê par hatibû Ewropê? Belê ez _____ hatibûm Ewropê.

Pêhînî 3

Aşağıdaki boş yerleri şu sözcükler le doldurun. “betirpêr, pêr, duh, iro, sibe, dusibe, sêsibe”

Mînak:

Tu sê roj dûre diçî welêt, ne wilo?

Belê ez _____ diçim welêt.

Tu sê roj dûre diçî welêt, ne wilo?

Belê ez sêsibe diçim welêt.

1 - Tu sê roj berê li ku bûyî?

Ez _____ li Amedê bûm.

2 - Bavê te du roj berê hatibû, ne wisa? Belê, ew _____ hat.

3 - Ma mihricanê rojek berê destpêkir?

Belê, Mihricanê _____ destpêkir.

4 - Navê roja em tê de çi ye?

Navê roja em têde _____ ye.

5 - Mirov ji roja per îro tê re çi dibêje?

Mirov dibêje _____.

6 - Mirov ji roja li pey sibe tê re çi dibêje?

Mirov dibêje _____.

Aşağıdaki bulmacanın altında verilen türkçe sözcüklerin körtçeleri sakıdır, onları bulun ve türkçe sözcüklerin yanına yazınız.

ocak _____

cumartesi _____ üç yıl önce _____

şubat _____

pazar _____

iki yıl önce _____

mart _____

pazartesi _____

geçen sene _____

nisan _____

salı _____

bu sene _____
mayıs _____
çarşamba _____ gelecek yıl _____
haziran _____
perşembe _____ iki yıl sonra _____
temmuz _____
cuma _____
üç gün önce _____
ağustos _____
vardiya _____ iki gün önce _____
eylül _____ şafak _____ dün _____
ekim _____ sabah _____ bugün _____
kasım _____ ikindi _____ yarın _____
aralık _____ akşam _____ öbür gün _____
_____ mevsim _____ gece _____ üç gün sonra _____
_____ ilkbahar _____ imsak _____ akşam _____
_____ yemeği _____
yaz mevsimi _____ kahvaltı altı _____ sabah _____
_____ yemeği _____
sonbahar _____ öğle yemeği _____ birazcık _____
_____ kış _____

Yek û du û sê

Ketine ser masê

Çar û pênc û şeş
Rêzbûne wek keleş

Heft û heşt û neh
Tenê hîştine deh

Yazdeh, dazdeh, sêzdeh
Du, sê, çar zêde ne ji neh

Çardeh, pazdeh, şazdeh
Ev in hêjmarên bingeh
Hivdeh, hijdeh, nozdeh
Vedikin pace û dergeh

Bi deh û bîst û sîh
Bijmêre bizin û mîh

Bi çil û pêncî û şêst
Ew tirsê we şikest

Heftê û heştê û nod
Wek gurzan têke lod

Sed, dused û sêsed
Bijmêr, nede wan fîrsed

Çarsed, pêncsed, şeşsed
Çi hêjmarên qurê û bed

Hevsed, heşsed, nesed
Wek paşayên Med.

Hezar û sedhezâr
Li bêrîkan dibin bar

Mîlyon û milyaran
Bavêjin binê kewaran!

- 1 yek
- 2 du (dudu)
- 3 sê (sisê)
- 4 çar
- 5 pênc
- 6 şeş
- 7 heft
- 8 heşt
- 9 neh
- 10 deh
- 11 yazdeh
- 12 dazdeh (diwazdeh)
- 13 sêzdeh
- 14 çardeh
- 15 pazdeh
- 16 şazdeh
- 17 hevdeh
- 18 hîjdeh
- 19 nozdeh
- 20 bîst
- 21 bîst û yek
- 23 bîst û sê
- 30 sî /sîh
- 34 sîh û çar

40 çil
45 çil û pênc
50 pêncî
56 pênceh û şeş
60 şêst
67 şêst û heft
70 heftê
80 heştê
90 nod
100 sed
200 dused
300 sêsed
400 çarsed
402 çarsed û du
974 nehsed û heftê û çar.
1000 hezar
2000 duhezar
3004 sêhezar
5706 Pênchezar û heftsed û şeş
10 000 dehhezar
10 10 9 Dehhezar û sed û neh
100 000 sedhezar
1 000 000 milyonek

peyvên din =diğer sözcükler

rêzbûn : dizilmek
keleş : yiğit, pehlivan
zêde : + , fazla
hejmar : rakam, sayı
bingeh : temel, taban
pace : pencere, açılım
dergeh : büyük kapı,
gurz : bağ, ot bağı
lod /dêz : yığın, ot yığını
bed : yüksek bir formda,
bêrîk : cep; pantol / ceket cebi
Şu hesapların yazılı cevabını yazınız.
Dikkatinize ; kürtçede + (artı)ya
“zêde”, =(eşite) de “yeksan” denir.
Sê + çar = _____
heft + pênc = _____
heşt + neh = _____
heft + neh = _____
şeş + pênc = _____

heşt + deh = _____
pênc + heşt = _____
hevdeh + heşt = _____
pazdeh + neh = _____
şazdeh + hîjdeh = _____
heft + nozdeh = _____
heft + sêzdeh + şeş = _____
neh + dazdeh + heşt = _____
hijdeh + bist + du
= _____
heftê û neh + heştê û şeş = _____
çil û heşt + nod û heşt = _____
pêncî û çar + hevdeh + çil = _____
sêsed û pêncî û du + heftsed û çil û yek = _____
nehsed û nod û neh + çarsed û çil û çar = _____
heştсед û bist û neh + dused û sîh û neh = _____

Şu rakamları yazı ile yazın.

3864
= _____
6954 = _____
4585 = _____
9469 = _____
3628 = _____
23097 = _____
74936 = _____
549606 = _____
659362 = _____
956040
= _____

Aşağıdaki rakamların yazılışları bulmacada saklıdır, onları bulun

ve rakamların karşısına yazın.

1 _____ 2 _____ 3 _____ 4 _____ 5 _____ 6 _____

7 _____ 8 _____ 9 _____ 10 _____ 11 _____

12 _____ 13 _____ 14 _____ 15 _____

16 _____ 17 _____ 18 _____ 19 _____

20 _____ 30 _____ 40 _____ 50 _____

60 _____ 70 _____ 80 _____ 90 _____

25 _____ 33 _____ 46 _____

100 _____ 200 _____ 300 _____ 400 _____

500 _____ 600 _____ 700 _____ 800 _____

900 _____ 1000 _____ 40 000 _____

1 000 000 _____

Helbesta paran

Em dudu nin, ez û kirîv
Emê sêva sor têkin şîv
Ji me her yek bixwe nîv
Nîvê min û nîvê kirîv

Em çar in li bin konê belek
Me sêv kir çar parên xelek
Ji me her yekî re ket çaryek
Min got; “çaryek,” te got; “çeyrek”

Em pênc in li malek
Me heye tenê sêvek

Me par kir her yek pariyek
Yanê tenê ji pêncan yek.

Sed kes li mêrgê ye
Tenê nanekî heye
Ma sedî yek besê wana ye
Ev wek çîroka dîna ye!

par : pay, hak
helbesta paran : pay şîiri
kirîv : kirve (bu da kûrtçe bir sözcük)
ji me her yek : bizden her biri
nîv : yarım
konê belek : alacalı göçebe çadırı
xelek : çember (bu da irani/ kûrtçe)
çaryek : çeyrek (çaryekin bozulmuş biçimi)
pariyek : birazcık
ji pêncan yek : beşte bir
ji dehan yek : onda bir.
ji çil û şeşan yek : kırk altıda bir
mêrg : çayır
ji sedî yek : yüzde bir
çîrok : öykü, hikaye
çîroka dînan : delilerin öyküsü

Dem û kat

Kato berê li saeta xwe dinêre, li pey li bilindahiya rojê dinêre, dû re jî vedigere û siya xwe bi lingan dijmêre. Siya wî du ling bû, wî cardin li saeta xwe nêrî, saet dazdeh û nîv bû. Xaskarê li wî sêr dikir. Ev tevgera Kato wek nûgerî li ser dilê Xaskarê rûniştibû. Ji wê bi nûgerî jê pirsî:

X - Kato ew çi ye tu wer dikî? Tu geh li saeta xwe dinêrî, geh li rojê û li pey jî siya xwe bi lingan dipîvî? K - Demên berê saet tinebûye, wan jî bo demê siya xwe wek pîvan bi kar anîne. Ez jî herduwan didim ber hev. X - Tu û Pelda hûn mirovên taybetî ne! Wê jî darekî kiribû navbera tiliya beranokê û destê xwe, siya darê wek pîvan bi kar dianî! Hûnê bibin zanyarên mezin! K - Tu wan cîh bihêle, saeta te çend e? X - Ji yekî re çeyrek dixwaze! Lê li bame nabêjin; “saet çend e?” Dibêjin; “saet çi ye? K - Belê herdu pirs jî tên bikaranîn, li ba me dibêjin; “ji yekî re çeyrek heye?” X - “Heye, dixwaze!” herdu jî yek in. Bê wê mirov dikane bibêje, ji sêzdan re çeyrek heye. K - Lê gava ji duduyan bist derbas be, tu çi dibêjî? X - Ez jî wekî te dibêjim. Lê mirov dikane ji çardan bîst derbas dibe, yan jî dibuhure bibêje. K - Ango li ba we dibêjin, saet ji çardan bîst dibuhure. X - Gundiyên cîwan dibêjin; “ji duduyan bîst derbas dibe!” Lê kal dibêjin; “dibuhure!” K - Min bibexşîne, saet di dudu û nîvan de Jivana min heye, divê ez biçim! X - “Jivan” tê wateya “randevu ango termînê” ne wisa? K -

Belê, bi kurdî ji “termînê” re “Jivan” dibêjin. X - Jivana min jî di nozdeh û bîst û pêncan de heye. Hûn ji deqîqe û saniyê re çî dibêjin. K - Deqîqe û saniye naguherin. Lê mirov dikane ji bo deqîqe “kêlî” jî bibêje! X - Kurdên Soran “katjimêr,” hin kurmanç jî “demjimêr” dibêjin ne wisa? K - Belê lê herî zêde peyva “saet” rûniştiye. De bi xatirê te, ezê dereng bikevim. X - Ji te re oxir be!

Wateya peyvan = Sözcüklerin anlamı: Bilindahî :yükseklik Du ling (nig) û nîv : ikibuçuk ayak Saet dazdeh û nîv bû. : saat 12,30 idi Sî : gölge Tevger : hareket Nûgerî / mereq : merak Pîvandî : ölçmek Pîvan : ölçü Bikaranîn / bikarhênan : kullanmak Herduwan /herduyan : ikisini, her ikisini Taybetî : özel, farklı özellik gösteren Tilî : parmak Tiliya beranokê : baş parmak Zanyar : bilgin Saet çend e? : Saat kaç? Saeta te çend e? : Saatin kaç? Çarek / çeyrek : çeyrek / dörtte bir Ji yekî re çeyrek dixwaze. : bire çeyrek var (istiyor) Ji yekî re çeyrek heye. : bire çeyrek var. Ji sêzdan re çeyrek heye. : Onüç çeyrek var Saet çî ye? : saat kaç ? Ji duduyan bîst derbas be! : ikiyi yirmi geçerse Ji duduyan bîst derbas dibe! : ikiyi yirmi geçiyor. Ji çardan bîst dibuhure : 14,20 geçiyor. Jivan : termin Saet di çendan de? : Saat kaçta? Saet di dudu û nîvan de. : Saat iki buçukta Deqîqe /kêlî : dakika Katjimêr / demjimêr : saat Bi xatirê te : hoşça kal De bi xatirê te. : haydî hoşça kal. Oxir be : uğurlar olsun. Nîvê şevê : Gece yarısı / saat 24 00 te Tu kengê diçî? : Ne zaman gideceksin? Ew çî wextê tê? : O ne zaman gelecek? Saeta destan : kol saati Saeta dîwar : duvar saati Saeta bangê : çalar saat

Navên parên laş

Berfîn nexweş e. Serî, ling, wesle, zik, sîng, dil, kezev, pişik, yanê bi kurtî her derê wê dêşe. Çavên wê ji ber êşa serî venabe. Bi tevê birayê xwe Sîpan rabû û çû doxtor. Doxtor ji Berfînê pirsî D - Kudera te diêşe? B - Her derê min diêşe bijîşkê delal. Doxtor destê xwe da piştê Berfînê, Berfîn qêriya: - Ayîîî dêşe! Doxtor destê xwe da zikê wê û hinek dewisand, Berfîn dîsa qêriya! - Ayîîî dêşe! Doxtor pîlê wê rakir, lê Berfîn dîsa qêriya! - Ayîîî dêşe! Doxtor piçek jî serê wê guvaşt, Berfîn dîsa qêriya. - Ayîîî dêşe! Doxtor keniya û got: - Berfîn metirse, tiştêkî te tine. Te tenê serma girtiye û tu bi zekemê ketiyî. Ez ji te re hin dermanan dinivîsim. Here têkeve nav nivînan, dermanê xwe bigire. Çaya pûngê vexwe, bila ji te re şorba kardiye çêkin wê bixwe. Berfînê got: - Heke tenê serma ye, çima her derê min dêşe? - Bi te wer tê, tenê ji ber bandora zekemê wer xuya dike. Hîç metirse! Berfîn hat mal, serê xwe pêça, piştê xwe girêda, gorên qalind kir lingê xwe û ket nav nivînan. Gava roja din jî xewê rabû, destê xwe da piştê xwe, pişt nedêşiya, serê wê jî xweş bûbû, tenê qurequra mede wê bû. Fêr kir ku birçî bûye. Berê ket serşoyê bi destê biçûk ser û çavên xwe şûşt, tiliyên zirav wekî şeyê seriyan di nav porê xwe re kir, piştê xwe û çîpên xwe krem kir, berê kincên xwe li xwe kir, paşê jî hat taştê xwar.

Kafa ile ilgili diğer sözcükler:

gep : yanak,
gamze : gamze
rû /dêm : yüz
palikê çav : göz kapağı
bîbik : göz bebeği
reşika çav : iris
kevçîka guh : kulak kepçesi
nermika guh : kulak kepçesinin yumuşak yeri
ziman : dil
diran /didan : diş
ezmanê dev : üst damak
pidî : diş etleri
tûk : tükrük

neynuk /nenuk : tırnak
zend : bilek
gulmiş/gurm : yumruk
gurçika dest : elin alt kısmındaki etli yumuşak yer

Amadekar: F. Melîk Aykoç
kaynak: www.yeniozgurpolitika.org
kürtçe sözlük: www.ferheng.org